


KURDE

HÛN BI XÊR HATINE

KANTONA VAUD



HEMÛ AGAHİYÊN BIKÊRHATÎ LI SER PORTALA PÊŞWAZIYÊ



Ji bo ku hûn bikarin bi lez rîbazên xwe
li cîhê rûniştina xwe bibînin, Portala
Pêşwaziyê prosedurên we hêsan dike.

Bureau Cantonal pour l'Intégration
des Etrangers et la Prévention du
racisme (BCI), agahdariyê ji bo
bicihbûnê hewcedariya we pê heyî
peyda dike û bi rîzikî tê nûjen kirin.

Serdana koda QR
a Portalê bikin



vaud-bienvenue.ch

Portal dihêle ku hûn çêtir ji pergala
sazûmaniyê (destûra rûniştinê, dibistan,
sigorte, kar, hwd.) û prosedurên kargêrî
yên ku têncîh kirin fam bikin, û di
heman demê de kesên têkiliyê yên ku
dikarin alîkariya we bikin jî nas bikin.

EDETEKÎ PÊŞWAZÎKIRINA NÛHATIYAN

Li kantona Vaudê pêşwaziya kesên nûhatî ne gotinek hêsan e, edet û îradeyek siyasi ya rastîn a rayedarên Vaudê ye. Ev edeta mîvanheziyê ji aliyê gelek aktorên weke dewlet, sazî û komeleyan ve tê meşandin.

Ew vedigere pêşniyarên cuda yên bi arman-
ca hêsankirina bicihbûna we û venasîna
hawirdora jiyana we ya nû. Di nav wan de, ev
broşûra ku tê xwestin ku weke búsoleyekê di
jiyana we ya rojane, kesane û pîseyî de rîbe-
riya we bike, we agahdar bike û bi rîve bibe.

Kanton ji ber ku pirrengiya nifûsa xwe ya ku
pê serbilind e li ber çavan bigire, Broşura
Pêşwazîkirinê werdigerîne gelek zimanan û
di formata dîjital de berdest dike da ku hindî
jê bê bigihîne zêdetir kesan.

Bi we ve girêdayî ye ku hûn wê venasin, bikar
bînin û di formen wê yên cûda de bidin nasin.

Di çarçoveyekê de ku girîng e têkilî were
domandin û bi pêşvebirin, em hêvidar in
ku Broşura Pêşwazîyê, fêkiyê berhevkirina
jêhatîbûnen hêja û cûrbecûr, weki ku bi gelek
salan wusa kiriye dê berdewam bike ku di
navbera we û kantona we de pêwendiyê
çêbike.

Amina Benkais

Delegeya Entegrasyonê ya Kantona Vaud û
Seroka Bureau cantonal pour l'intégration des
étrangers et la prévention du racisme (BCI).

NAVEROK

LI GEL GIHİSTINA WE, DIVÊ
HÛN ÇI BIKIN...



1 DESTÜRA RÛNIŞTINÊ

- | | |
|--|----|
| 1.1 Kar, xwendin, beşdarbûna
endamekî malbatê | 6 |
| 1.2 Gavêñ divê bêñ bicih anîn ji bo
destûra rûniştinê | 12 |
| 1.3 Pena | 13 |



2 KÛRSÊN FRENSÎ

- | | |
|-------------------------------|----|
| 2.1 Férbûna Frensî | 16 |
| 2.2 Sertîfika | 17 |
| 2.3 Kûrsên Frensî yên Berdest | 18 |



3 KAR

- | | |
|---------------------------------|----|
| 3.1 Şertên gihîstina bazara kar | 27 |
| 3.2 Berî destepêkirina kar | 28 |
| 3.3 Karek min heye | 30 |
| 3.4 Heke min karê xwe wenda kir | 33 |

4



4 RÛNIŞTGEH

- | | |
|--|----|
| 4.1 Ditina rûniştgehê | 40 |
| 4.2 Alîkarî | 43 |
| 4.3 Gilêş vebijartin | 46 |
| 4.4 Rêbernameyêñ ji bo têkiliyêñ baş
êñ cîrantiyê | 47 |




5 SİGORTE, ALÎKARIYA CIVAKÎ Û BAC

- | | |
|--|----|
| 5.1 Sigorteya civakî | 49 |
| 5.2 Sigorteya tenduristiyê | 50 |
| 5.3 Pergala sê-stûnî û sigorteya
békariyê | 51 |
| 5.4 Sigorteya girêdayî dayikti
û zarokan | 55 |
| 5.5 Alîkariya civakî | 57 |
| 5.6 Sigorteyêñ din | 58 |
| 5.7 Bac | 61 |
| | 62 |




6 TENDURİSTÎ

- | | |
|----------------------------------|----|
| 6.1 Pirşyar li kû û kê tê kirin? | 63 |
| 6.2 Dêûbab bûn û jidayîkbûn | 64 |
| 6.3 Tundiya nav malê | 68 |
| | 71 |




7 DIBISTAN Û PERWERDE

- | | |
|--|----|
| 7.1 Péş-dibistan | 74 |
| 7.2 Ji 4 heta 15 salı: dibistana mecbûrî
û lénérîna biroj ji bo zarokan | 76 |
| 7.3 Ji 15 salı pê ve | 80 |
| 7.4 Dítina perwerdeyê li gel gihiştinê | 81 |




11 MAFÊN SIYASÎ Û WELATÎBÛN

- | | |
|---|-----|
| 11.1 Mafên siyasi di asta şaredariyê de | 106 |
| 11.2 Siyaset li Swîsreyê | 107 |
| 11.3 Bûna Swisi: welatîbûn | 108 |




8 REWSA MEDENÎ

- | | |
|---------------------------------|----|
| 8.1 Qeydkirina Jidayîkbûnê | 84 |
| 8.2 Naskirina bavîtiyê | 85 |
| 8.3 Zewac | 86 |
| 8.4 Prosedur di rewsa mirinê de | 89 |



12 TERCIME Û WERGER

- | | |
|-----------------------|-----|
| 12.1 Tercimeya civakî | 112 |
| 12.2 Wergerên nivískî | 113 |



9 JIYANA ROJANE

- | | |
|------------------------------|----|
| 9.1 Geryan li herêma Vaudê | 92 |
| 9.2 Aborî | 94 |
| 9.3 Telekomunikasyon û kirîn | 96 |




13 KANTONA VAUD

- | | |
|----------------|-----|
| 13.1 Erdîngarî | 116 |
| 13.2 Dîrok | 117 |



10 DEMA VALA Û JIYANA CIVAKÎ

- | | |
|--------------------|-----|
| 10.1 Zarok û ciwan | 98 |
| 10.2 Mezin | 100 |



14 TÊKİLİYÊN BIKÊRHATÎ

121

LI GEL GIHIŞTINA WE, DIVÊ HÛN ÇI BIKIN...

1

Di nav **8 rojêñ** piştî barkirina xwe de, bi van **belgeyêñ** jérîn, hatina xwe ji Contrôle des Habitants ya şaredariya xwe ya niştecîbûnê re bi kesane bidin zanîn:

- Belgeya nasnameyê ya derbasdar bi vîzeya têketinê, heke hebe

- Kirênameya we ya bi navê we tê gotin. Heke navê we di kirênameyê de xuya nebe, dive hûn yêñ li jér peyda bikin:
 - Belgeyek bi dîrok û îmzekirî ji xwendiyê xanîyê we (divê navê we li ser vê belgeyê xuya bibe)

- Wêneyekî pasaportê

Pêdivî ye ku hûn xercên qeydkirinê (herî zêde 40 CHF) bi karta krediyê an bi pereyê pêşin bidin, ji bilî lêçûna destûra rûniştinê.

Contrôle des Habitants (Ofisa Kontrolkirina Niştecîhiyê) dibe ku ji we pirsan li ser dînê we bike. Ev agahdarî tenê ji bo armancêñ statistikiye û ti bandorek li ser prosedurêñ pêşerojê nake. Bersiv ne mecbûrî ye.



HIŞYARÎ

Divê hemû zarokên di temenê dibistanê de biçin dibistanê, bêyi ku destûra rûniştina wan an pêşkeftina prosedurên îdarî hebe.

2

Sigorteya tenduristiyê ya mecbûrî, herî dereng 3 meh piştî hatina xwe bistînin.

ZÊDETIR AGAHDAKİ

5.2 Sigorteya tenduristiyê

3

Heke zarokên we yêñ di temenê dibistanê de (ji 4 salî pê ve) hebin, divê hûn wan di zûtirîn dem de li dibistana herî nêzîk qeyd bikin.

DIBISTANEKÊ BIBÎNE

7 Dibistan û perwerde

vd.ch > Autorités >

Département de

la formation, de la jeunesse et de la culture (DFJC) > Direction générale de l'enseignement obligatoire (DGEO) > Les établissements scolaires





1.1 KAR, XWENDIN, BEŞDARBÜNA ENDAMEKÎ MALBATÊ	6
1.2 GAVÊN DIVE BÊN BICIH ANÎN JÎ BO DESTÜRA RÛNIŞTINÊ	12
1.3 PENA	13

1.1 KAR, XWENDIN, BEŞDARBÛNA ENDAMEKÎ MALBATÊ

LI SWÎSREYÊ KAR

☒ Ewropî yên YE û EFTA

Ewropî, hemwelatiyên dewleteke ji YE an EFTA, ji gerîna serbest a kesan bi Swîsre re sûd werdigirin. Ew dikarin bêñ û 6 mehan bêýî vîze li Swîsreyê li kar bigerin û ger çavkaniyên têra wan hebin û hewceyî alîkariya civakî nebin, dikarin li Swîsreyê bi cih bibin.

☒ Welatiyên welatên sêyemin

Ji bo welatiyên ku ne xwedî avantaja gerîna serbest in, hatin û li Swîsreyê xebat bi zehmettir e. Karsazê ku dixwaze kar bide wan divê ji Xizmeta Îstihdamê (DGEM) re nişan bide ku wan ne li Swîsreyê (di nav niştecîhên Swîsreyî an biyanî de) û ne jî li Ewropayê (di nav welatiyên dewletên YE an EFTA de) kesek nedîtiye ku wê pozîsyonê bigire. Welatiyên welateki sêyemîn ku dibe ku werin û li Swîsreyê bixebeitin, ji ber vê yekê divê xwedîyê wesfên profesyonel ên newaz û di astek bilind de bin.

☒ FERHENG

Yekîtiya Ewropî (YE)

Yekîtiya siyasi û aborî ya ji bîst û heft dewletên Ewropî pêk tê ku bi peymanan bikaranîna hin hêzan ji organên civakê re neqil dike an vediguhezîne.

Sazûmana Bazirganiya

Serbest a Ewropayê (EFTA)
Sazûmana çar dewletan
(Îzlanda, Lîchtenstein,
Norwêc û Swîsre) bi armanca
avakirina herêmeke bazirganiya serbest li Ewropayê.

Welatê Seyêmîn

Dewleta ku ne endamê Yekîtiya Ewropî an Sazûmana Bazirganiya Serbest a Ewropî ye. Ev dewletek e ku Swîsre bi wê re peymanek li ser gerîna serbest a mirovan nîne.

Wekî din, hejmara destûrên ku ji van welaatiyên derveyî Yekîtiya Ewropî û EFTA re têne terxandin, bi sîstema kotayê ve têne sînorkirin. Ji bo kantonê her sal hejmareke sînordar a destûran tê terxandin.

BEŞDARBÛNA ENDAMEKÎ MALBATÊ

Hevgîhîna malbatê dihêle hevjin û zarokên biçûk ku bi kesekî Swîsreyî an biyanî yê ku li Swîsreyê xwedîyê destûra rûniştinê ye, bi hev re bibin an jî tev li hev bibin.

☒ Ewropiyên YE û EFTA

Têgîna hevgîhîna malbatê ji bo zarokên ji 18 salî heta 21 salî û ji wan mezintir jî heke hêjî mihtac bin tê berfirehkirin.



MOHLETA HEVGİHÎNA MALBATÊ(ZAROK)

Welatiyek welatê sêyemîn ku xwediye destûra rûniştinê ye, ji roja zewacê, naskirina daxwaznameyê an wergirtina destûra rûniştinê ve 5 salên wîê hene ku hevjîn an zarokê xwe bîne.

Not

Gava ku zarok gihiştin 12 saliyê, mohleta anîna wan bixwe tenê dibe salek.

Mînak

Zilam di sala 2020an de tê Swîsreyê û xwediye destûra rûniştinê ye. Zarokê wî yê 10 salî li derveyî welat e. Zarok dikare heta sala 2023yan were Swîsreyê: zarok di sala 2022an de dibe 12 salî û paşê tenê salek dimêne ku heqê hevgihîna malbatê bi dê/bavê xwe re li Swîsreyê werbigire.

↪ Welatiyêñ welatêñ sêyemîn

Ji bo welatiyêñ mezin ên welatêñ sêyemîn ên ku serlêdana destûra rûniştinê dîkin da ku bi mîrek an jînek, an partnerek qeydkirî ku di heman demê de welatiyekî welatê sêyemîn e ji li Swîsreyê bi hev re bibin an bi gîhîjin hev, astek mînîmûn azanîna Frensî hewce dike.

Li kantona Vaudê, heke asta mînîmûm a Frensî neyê bidestxistin, divê hûn vê hewcedariya zimanî ñalekê de bicîh binin. Ji bo zêdetir agahdarî, li ser rûpelên 10-11, li quâka Astêr Ziman ku ji hêla Qanûna Federal li ser Welatiyêñ Biyanî û Entegrasyonê (FNIA) û Qanûna Federal li ser Welatibûna Swîsreyê (SCA) hewce dike binérin.

XWENDIN LI SWÎSREYÊ

↪ Ewropiyêñ YE û EFTA

Ji bo Ewropiyêñ ku welatiyêñ dewletêñ YE an EFTA ne, hewcedariyê taybetî nînin ku besdarî saziyeke perwerdehiyê li Swîsre bibin. Dîsa jî divê ew, wekî welatiyêñ welatêñ sêyemîn, bikaribin xwe bi darayî debara xwe bikin.

↪ Welatiyêñ welatêñ sêyemîn

Welatiyêñ welatêñ sêyemîn divê nişan bidin ku armanca wan a xwendina li Swîsreyê beşek ji projeyek perwerdehiya hevgirtî ye. Destûra rûniştinê bi demkî ye û tenê ji bo demê xwendinê derbasdar e.

Not

Ev mohlet ji bo kesen ku li Swîsreyê besdarî welatiyekî YE an EFTA dibin ne derbasdar e.

NÜKIRINA DESTÛRÊ

Gava ku destûr bi dawî hat, rayedarên federal «Hişyariya bidawîbûna derbasdarîyê» ji şaredariya we re an rasterast ji we re dişînin. Dûv re divê hûn daxwaznameyeke nûvekirinê pêşkêşî komuna xwe ya niştecihbûnê bikin, ku ew ê wê ji servîsa kantonê ya rayedar re bişîne (Service de la Population, SPOP). Rewşa we û asta we ya entegrasyonê, bi taybetî xweseriya we ya aborî têne lêkolîn kirin.

Dibe ku destûrnameya nû di gav de neyê dayîn, ji ber ku cildêن serlêdanêن ku têne kirin pir mezin in. Di vê rewşê de, rayedârên koçberiyê yên kantonê helbet heya ku serlêdan bi dawî neyê mayîna we na rapirsin. Heke hûn rêuwiya derveyî welat dikin, divê hûn pêşî ji bo «vîzeya vegevê» serî li gîşeya Service de la Population bidin, da ku hûn di nebûna destûra nû de bikaribin vegeerin Swîsreyê.



DESTÛRÊ RÛNIŞTINÊ YÊN CÛR BI CÛR

**REWŞÊN KU DIKARE
DESTÛRA RÛNIŞTIN AN
NIŞTECIHBÛNÊ BI DAWÎ BÎNE,
BETAL BIKE AN NÛ NEKE.**

- ⇒ Éris an sûcê ku di encama mehkûmkirinê de biryara dersînorkirinê hatiye dayîn.
- ⇒ Di bin hin şert û mercên taybet, wek wê bûyera ku bidawîbûna yekitiya zewacê bi kesê ku li gel hevgihîna malbatê hatiye kirin.
- ⇒ Tibabeke girîng a alîkariya civakî wergirtiye.
- ⇒ Di dawiya kûrsê de (qediya an qutkirî), destûra rûniştina demkî ya ji bo xwendinê nayê nûkirin.
- ⇒ Ci gava derketina ji Swîsreyê hate ragîhandin an piştî mayîna ji 6 mehan zêdetir li derveyî Swîsreyê bêyî lihevkirina berê li gel rayedaran.

B**DESTÛRA
RÛNIŞTINÊ****Welatiyê welatê sêyemîn**

Maweya salekê, dibe ku ji bo 2 salan were nûve kirin.

Welatiyê Ewropî (YE, EFTA)

Maweya ji salekê dirêtir, ji bo 5 salan dikare were nûve kirin. Derfeta kar bi rewşa mirov ve girêdayî ye.

C**DESTÛRA
NIŞTECIHBÛNÊ**

Destûra niştecihbûnê êdî ne girêdayî sedema mana li Swîsreyê ye. Destûr (belge) 5 salan carekê tê nûkirin. Bi giştî, destûra C tenê ji bo kesên ku xwediyê destûreke B ne, piştî 5 an 10 salan li gorî rewşê tê dayîn. Rê dide çalakîyen mifadar.

F**QEBÜLKIRINA
DEMKİ**

Ji bo kesên ku bi awayekî fermî mafê penaberiyê ne wegirtine, lê dikarin bi qanûnî li Swîsreyê bimînîn, tê dayîn. Derfeta kar bi heman awayî wekî xwediyê destûreke B an C an ji welatiyekî Swîsreyî. Di rewşa entegrasyona serketî de (bi taybetî xweseriya aborî û nebûna mehkûmbûnê) destûra F dikare vegere destûra B.

G**DESTÛRA
DERBASKIRINA SÎNOR**

Ji bo kesên ku li Swîsreyê kardikin lê rûniştina wan a sereke ne li wir e.

L**DESTÛRA RÛNIŞTINÊ
YA DEMKURT****Welatiyê welatê sêyemîn**

Maweya heta salekê, dibe ku salê carekê were nûve kirin.

Welatiyê Ewropî (YE, EFTA)

Ji bo dema rûniştina yekem (ji salekê këmtir) tê nûkirin. Derfeta karkirinê bi rewşa mirov ve girêdayî ye.

N**DESTÛR JI BO
PENAGERAN**

Çi gava xwedan ji Navenda Pena-beriyê ya Federal derkeve û ji aliyê Konfederasyonê ve girêdayî Kantonê be, mafê wan heye ku kar bikin.

S**DESTÛRA JI BO
KESÊN KU HEWCEYÊ
PARASTINÊ NE**

Destûra rûniştinê ya demki ji bo Swîsreyê. Mafê rûniştinê heta bi dawîbûna dema derbasbûna destûrê nayê garantikirin. Her karekî nû an guhertina kar bi destûrek berê ve girêdayî ye.



ASTÊN ZIMAN JI HÊLA QANÛNÊ VE TÊN XWESTIN

Qanûna Federal li ser Welatiyên Biyanî û Entegrasyonê (FNIA) û Qanûna Federal li ser Welatibûna Swîsreyê (SCA) ji desthilatdariya kantonê ferz dike ku şareziyîn ziman ên kesên ku welatiyên biyanî ne li ber çavan bigire. Ji ber vê yekê, Encûmena Federal asta ziman a mecbûrî ku ji bo hevgîhîna malbatê, nûkîrina destûra rùniştinê (destûra B), dayîna destûra niştecihbûnê (destûra C), û her weha prosedûra welatîbûna Swîsreyê diyar kiriye.

QEBUGÜLKIRINA DEMKİ (DESTÛRA F)

A1 DEVKÎ

Hevjîn bi rêya hevgîhîna malbatê (penaber jî di nav de) bi awayekî demki tê qebûlkirin. (Bend. 74a ASEO).

RÙNIŞTIN (DESTÛRA B, DERVEYÎ YE-EFTA)

A1 DEVKÎ

Hevjîna xwedîyê niştecihbûnê an ku bi rêya hevgîhîna malbatê bi destûra rùniştinê. (Bend. 73a ASEO). Ve-qetîna zecaw an malbatê (Bend. 77 ASEO).

NIŞTECIHBÛN (DESTÛRA C YA GIŞTİ)

A2 DEVKÎ A1 NIVÎSKÎ

Piştî rûniştina 10 salan tê dayîn (Bend. 60 ASEO). Destûra nû piştî mana li derveyî welat (Bend. 61 ASEO) an piştî paye daxistinê (Bend. 61a ASEO).

Hevjîna xwedîyê destûra niştecihbûnê an welatiyekî Swîsreyî (Bend. 73b ASEO). Welatiyên hin welatê* ku bi Swîsreyê re peymanê damezrandinê hene, ji şertê zimanê Frensi muaf in.

VEGERÎNA DESTÛRA B BO DESTÛRA C

Destûra niştecihbûnê (destûra C) ji destûra rûniştinê (destûra B) statûyeke saxlemtir pêşkêş dike. Piştî mawemekî ji 5 heta 10 salan, li gorî niştevanî û sedema mayînê, kesek xwediyyê destûra B dikare serlêdana destûra C bike.

Ji bo hemwelatiyên welatên ne-fransî-axêv, sertifikayek fermî ya asta fransî girînge da ku destûrnameyek C bistînin.

MIROVÊN BÊYÎ DESTÛRA RÛNIŞTINÊ

Mewzûata Swîsreyê di bin hin şertan de rê dide kesên ku bêyî destûra rûniştinê li Swîsreyê dijin bê sazkirin; heke entegrasyona wan serketî be û dema mayîna wan bi girîngî û têra xwe hatibe îsbatkirin. Bi awayekî beyan, serîlêdanji Kantonê (Service de la Population – SPOP) re tê şandin, ku biryarê dide ka wê ji rayedarên federal re bişîne. Rêzname tenê gava ku ji hêla Konfederasyonê ve hate pejirandin bi bandor e.

SAZUMAN (DESTÛRA C YA PÊŞİNDE)

B1 DEVKÎ A1 NIVÎSKÎ

Destûra pêşînde piştî 5 salên mayînê (Bend. 62 ASEO).

WELATÎBÛN

B1 DEVKÎ A2 NIVÎSKÎ

Welatîbüna giştî piştî 10 salan. Ji bo hevîjîna welatiyekî Swîsreyî, piştî 5 salan welatîbüna hêsankirî (Bend. 6. SCO)

1.2 GAVÊN DIVÊ BÊN BICIH ANÎN JI BO DESTÛRA RÛNIŞTINÊ

DIVÊ EZ TÊKILYÎ BI KÊ RE DANIM?

→ Ewropiyê YE û EFTA

Bi şaredariya li Swîsreyê ku rûniştina we lê ye têkili danin (Contrôle des habitants).

→ Welatiyên welatên din

Bi nûneratiya Swîsreyê (balyozxane an konsulxane) ya ku li welatê rûniştina we lê ye têkili danin.

Di herdû rewşan de, dê dosya ji Service de la Population a kantona Vaud re were şandin, da ku serlêdan were prose kirin.

BELGEYÊN BO
SERLÊDANÊ
DIVÊ BÊN PEYDA KIRIN
vd.ch > Thèmes >
Population > Population
étrangère > Entrée et séjour



JI BO EWROPIYAN DESTÛRÊN RÛNIŞTINÊ (YE, EFTA): BELGEYÊN FORMATÂ KREDÎ QERTA NÛ

Ji 1 Tîrmeh 2021 ve, Ewropiyên ku ji gerîna serbest sôd werdigirin (welatiyên Yekîtiya Ewropî an Sazûmana Bazirganiya Serbest a Ewropî) ku destûrên xwe werdigirin an nû dikin, li şûna belgeya kaxezê, di formata karta krediyê de belgeyek lamînkirî distînin.

Ev nûyatî ji bo wan tê wateya ku her 5 salan carekê ji bo qeydkirina daneyên dîjîtal biçin Navenda Biyometrik û Belgeyên Nasnameyê li Lausanne (li Flon). Di karta pêşerojê de dê îmze û wêneyekî bi formata dîjîtal hebe.

Heta niha, tenê welatiyên welatên sêyemîn xwedîyê kartêne weha bûn (serdana Navenda Biyometrikê tê xwestin).

DADWERİYA FEDERAL

Biryara dayîna an nedayîna statuya penaberiyê bi xumalî bi rayedarên federal re ye (Secrétariat d'État aux migrations et Tribunal administratif fédéral). Kantonan di proseya penaberiyê de raye nîne.

KRÎTER

Krîterên entegrasyonê ji bo nirxandina serlêdana penaberiyê nayêن bikar anîn.

Ji bo naskirina statuya penaberiyê û dayîna mafê penaberiyê, rayedarên federal berê xwe didin ka hewcetî bi parastinê heye an na. Ew dinirxînin ka ew kes li welatê xwe di bin xetereyê de ye an na. Ji ber vê yekê krîterên entegrasyonê li Swîsreyê ji bo nirxandina serlêdana penaberiyê nayêن bikar anîn.

Kesêن ku mafê penaberiyê werdigirin destûra rûniştinê (Destûra B) distînin. Kesêن ku tenê xwedî statuya penaberiyê ne an jî nikarin bêñ vegerandin «Destûra Demkî» (Destûra F) distînin. Divê yên din hemî li Swisreyê nemînin.

RÊZNAMEYA KESÊN SERLÊDANA WAN A PENABERIYÊ HATIYE RED KIRIN

Di bin hin şert û mercan de, bi taybetî heke herî kêm 5 sal li Swîsreyê bir, bêyi ku sûcek kiribin û heke rayedar her dem cihê mana wan zanibin, kesêن ku mafê penaberiya wan hatiye red kirin dikarinji Kantonê bixwazin ku pêşniyarekê ji bo serarastkirinê pêşkêşî rayedarên federal bikin (Bend. 14, para.2 Asyla).

NOT



un évier



Un moule à
gâteau



mite à
vapeur

un décaps



une tasse



2 KÛRSÊN FRENSÎ

- | | |
|-------------------------------|----|
| 2.1 FÊRBÛNA FRENSÎ | 16 |
| 2.2 SERTİFİKA | 17 |
| 2.3 KÛRSÊN FRENSÎ YÊN BERDEST | 18 |



2.1 FÊRBÛNA FRENSÎ

BI KURTÎ

Fêrbûna zimanê welatê ku hûn dixwazin lê bi cih bibin jiyana rojane gelek hêsan dike. Ev dihêle ku hûn agahdarî werbigirin, karekî bibînin, li gel cîranêñ xwe têkilî daynin, jiyana xwe ya civakî pêş ve bibin û di fêrbûna wan de alîkariya zarokên xwe bikin.

Qanûna integrasyonê dide zanîn ku divê mirov xwe bielimînin civak û awayê jiyana li Swîsreyê û fêrî zimanekî neteweyî bibin. Ji bo hin proseduran, wek nûkirina destürekê, rêveberiya kantonê dikare ji we belgeya asta Frensî ya we bixwaze.

ASTÊN ZIMAN

vd.ch > Thèmes >
Population > Population étrangère > Entrée et séjour > Federal Act on Foreign Nationals and Integration (FNIA)



ZÊDETIR AGAHDARÎ

7.4 Li gel gihiştinê perwerdehî dîtin

Ji bo mezinan, gelek kûrsêñ Frensî li seranserê herêma Vaud têne pêşkêş kirin. Di vê beşê de du cûreyên kûrsan hene: yên dibistanêñ taybet û yên sazûmanan.

ŞÊWIR

Rêyeke gelek baş a fêrbûna Frensî ev e ku hûn bi mirovîn din re hevdîtin bikin û beşdarî çalakiyên bidil, dema vala an entegrasyona civakî bibin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

10 Dema vala û jiyana civakî
7 Dibistan û perwerde

DIBISTANÊN TAYBET

Dibistanêñ taybet kûrsêñ Frensî pêşkêş dikin. Ev kûrs, bi lêçûnêñ bilindit, xwedî pilanêñ nermtir û daxwazêñ qebûlkirinê yên cûrbicûr in.

Hûn dikarin pêşniyarekê bi serdana malpera local.ch û têketina «Dibistana Ziman» di motora lêgerînê de bibînin.

Di malpera Sazûmana Vaud a Dibistanêñ Taybet (AVDEP) de rêbernameyeke van hemî dibistanêñ taybet heye.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

7.2 Ji 4 heta 15 salî: dibistana mecbûri û lênenîrîna biroj ji bo zarokan

Ji bo ciwanêñ ji 15 heta 20 salî yên nûhatî, dersêñ pêşwaziyê dihêlin ku fêrî Frensî bibin û perwerdehiyê bibînin. Serlêdana ji bo qebûlbûnê bi réya Portala Koçberiyê tê kirin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

avdep.ch

2.2 SERTÎFÎKA

STENDINA SERTÎFÎKAYEKÊ

Ji bo hin proseduran (wek mînak ji bo serîlêdana destûra B, nûkirin, destûra C ya pêşbînîkirî an prosedureke welaftibûnê), rêveberî dê ji we belgeyeke asta Frensî ya we bixwaze.

Testa FIDE (Frensî, Elmanî, Îtalî) projeyeke Konfederasyonê ya teşwîqkirina zimanî bo koçberan e. Ev test dihêle hûn jêhatîyên xwe yên devkî û nivîskî kontrol bikin û pasaporteke zimanî ya ku asta Frensî ya we tesdîq dike bistînin. Rêxistinên cuda van nirxandinan pêşkêş dîkin. Ji bo bêtir agahdarî li ser navendên nirxandinê û daniştinên testê, ji kerema xwe serdana malpera pasaporta ziman bikin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

fide-info.ch

Sertifikayê din jîji bo derxistina pasaporta ziman têne nas kirin, wek sertifikaya Diplôme d'études en langue française (DELF). Ji bo bidestxistina wê, divê hûn ezmûneke Frensî ya nivîskî û devkî derbas bikin. Ji bo zêdetir agahdarî li ser daniştinên ezmûnê, ji kerema xwe serdana malpera Fondation Esprit Francophonie bikin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

delfdalch.ch

1.1 Kar, xwendin, beşdarbûna
endamekî malbatê

DAXWAZKIRINA SERTÎFÎKAYEKÊ

Heke we jixwe sertifikaya zimanekî din li Swîsre yan jî li derveyî welat wergirtiye û di listeya sertifikayê naskirî de ye, hûn dikarin wê ji Sekreteriya Fide re bişînin. Ew ê pasaporta ziman a ku li ser astêن têkildar, bi devkî û nivîskî, tesdîq bikin, bi wergirtina 20 CHF xerc bidin we.


Heke jêhatiniyêن we yên zimanî di asta B1ê an bilindir bin, pêşkêşkirina dosyayeke pêbawer dibe ku jî bo bidestxistina pasaporta ziman rêya herî hêsan û biley be.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

fide-service.ch/fr/attestations/dossier-fide

2.3 KÛRSÊN FRENSÎ YÊN BERDEST

KÛRSÊN FRENSÎ



SAZUMANÊN LI KANTONÊ KU KURSÊN FRENSE PÊŞKÊŞ DIKIN

Dewlet destekê dide kûrsên Frensi yên ji hêla sazûmanan ve têne dayîn. Ev kûrs ji hêla pîsporêن perwerdekirî ve têne dayîn û ré ji bo budceyêن biçük heye. Sefêن pêşwaziyê carinan bi dersan re paralel têne peyda kirin. Hûn ê li jêr hin sazûmanêن ku kûrsên Frensi pêşkêş dikin bibînin. Hemî hûrgiliyêن di derbarê hemî pêşniyaran de li ser portala internetê ya "Hûn Bi Xêr Hatine Kantona Vaud" liberdest û guncaw in.

**NAVNÎŞA SAZUMANÊN
ONLINE**

🌐 [vaud-bienvenue.ch/
cours-de-francais](http://vaud-bienvenue.ch/cours-de-francais)



HERÊMA ROJHILAT

- 01
- 02
- 03
- 04
- 05
- 06
- 07
- 08
- 09
- 10
- 11

PAYS D'ENHAUT

RIVIERA

AIGLE

KURSÊN FRENSE

HERÊMA ROJHILAT

01 Appartenances – Espace femmes riviera

Kûrsên Frensi; ji bo jinêن ducanî yên koçber an dayikêن zarokêن biçük, li ser temayêن «Ducanî, welidandin û zarokatiya zû», bi lénêrîna zarokan ji bo zarokêن di temenê pêşdibistanê de. Pêşwazikirin, civîn û rênîşandina cîvakî ji bo jinêن koçber ên bi zarok an bê zarok.

- 📍 Vevey
- 📞 021 922 45 23
- ✉️ ef:vevey@appartenances.ch
- 🌐 appartenances.ch

02 Association AMIS

Kûrsên Frensi yên bi lénêrîna zarokan re ji bo zarokêن di temenê pêşdibistanê de. Atolyeya sihbetê ji bo jinêن koçber û Swisreyî, û her wiha ji bo zarokêن wan ên pêşdibistanê.

- 📍 Aigle
- 📞 024 466 76 00 | 077 507 62 17
- ✉️ info@planchette.ch
- 🌐 planchette.ch

03 Şaredariya Bex/LIBex

Kûrsên Frensî. Kursên ji bo mezinêñ ku zarokekî wan li Bex dixwîne, li ser xebata dibistanê û atolyeyêñ sihbetê. sihbetê disechine.

- ⌚ Bex
- 📞 079 686 6110
- ✉️ francais@bex.ch

04 Şaredariya Château-d'Œx

Kûrsên Frensî.

- ⌚ Château-d'Œx
- 📞 076 387 53 22
- ✉️ c.morier-genoud@bluewin.ch

05 Şaredariya Montreux

Kûrsên Frensî. Çalakiyêñ civakî yên cûrbicûr ji bo fêrbûn û pratikkirina Frensî.

- ⌚ Clarens
- 📞 079 228 62 16
- ✉️ info@francais-clarens.ch
- 🌐 francais-clarens.ch

Atolyeyêñ pêkguhartin û parvekirina serpêhatiyêñ jiyanê, bi Frensî, ji bo jinêñ koçber ligel zarokêñ xwe.

- ⌚ Clarens
- 📞 078 845 86 18
- 🌐 montreux.ch/habiter-et-decouvrir/integration/associtions-et-projets-dintegration

06 Şaredariya Roche

Kûrsên Frensî.

- ⌚ Roche
- 📞 077 407 58 75
- ✉️ integration@roche-vd.ch

07 Şaredariya Villeneuve -

**Commission d'Intégration
Villeneuve (CIV)**

Kûrsên Frensî û atolyeyêñ sihbetê.

- ⌚ Villeneuve
- 📞 077 407 58 75
- ✉️ integration@villeneuve.ch

08 ECAP Vaud

Kûrsên Frensî.

- ⌚ Vevey
- 📞 021 923 59 90
- ✉️ infovd@ecap.ch
- 🌐 ecap.ch/fr

09 Français en jeu

Kûrsên Frensî.

- ⌚ La Tour-de-Peilz, Clarens, Lutry, Paudex, Montreux
- 📞 021 552 44 05
- ✉️ riviera@francaisenjeu.ch
- 🌐 francaisenjeu.ch/poles/est-vaudois/

Kûrsên Frensî ji bo nûdestpêkirian. Ji bo dêûbavêñ dixwazin fêri ziman bibin da ku çêtir fêm bikin ka zarokêñ wan li dibistana Vaud ci dijîn.

- ⌚ Vevey, Clarens, Montreux, Pully, Aigle
- 📞 021 552 44 05
- ✉️ riviera@francaisenjeu.ch
- 🌐 francaisenjeu.ch/poles/est-vaudois/

10 Lire et écrire

Ji bo mezinêñ bi pirsgirêkên nexwendewariyê dersêñ xwendin û nîvîsinê.

- ⌚ Vevey, La Tour-de-Peilz, Clarens, Aigle
- 📞 021 922 46 10
- ✉️ riviera@lire-et-ecrire.ch
- 🌐 lire-et-ecrire.ch/vaud

11 Bajarê Vevey

Kûrsên Frenşî. Atolyeyêن pêkguhartin ú parvekirina serpêhatiyêن jiyanê, bi Frenşî, ji bo déübavêن koçber. Atolyeyêن sihbetê ji bo jinêن koçber li gel zarokêن xwe.

- ⌚ Vevey
- ☛ 021 925 53 18
- ✉ cohesion.sociale@vevey.ch

HERÊMA LAUSANNE

♀ ŞEWIR

Ji bo lîsteyeke berfireh a kûrsên Frenşî li Lausanne, hûn dikarin tekîlî bi Bureau lausannois pour les immigrés(BLI) (p. 22) re daynin.

12 Appartenances – Espace femmes Lausanne

Kûrsên Frenşî; ji bo jinêن ducanî yên koçber an dayikêن zarokêن biçük, li ser temayen «Dîcanî, welidandin û zarokatiya zû», bi lénêrîna zarokan ji bo zarokêن di temenê pêşdibistanê de. Pêşwazîkirin, civîn û rênîşandina civakî ji bo jinêن koçber ên bi zarok an bê zarok.

- ⌚ Lausanne
- ☛ 021 351 28 80
- ✉ ef.lausanne@appartenances.ch
- 🌐 appartenances.ch

13 Appartenances – Espace hommes Lausanne

Kurs û atolyeyêن Frenşî yên danasînê ji bo zilamêن koçber. Berdewamiya pêşwazîkirin, guhdarîkirin û rênîşandin ji bo zilamêن koçber di rewşenê psikolojîk ên bi xeter de.

- ⌚ Lausanne
- ☛ 021 320 01 31
- ✉ eh.lausanne@appartenances.ch
- 🌐 appartenances.ch

14 Armée du salut

Kûrsên Frenşî.
⌚ Lausanne
☛ 021 312 73 52
🌐 ads-arclemanique.ch

15 Association Nouvelles perspectives

Rojên şemiyê kûrsên Frenşî
û atolyeyêن sihbetê.
⌚ Lausanne, Chavannes-près-Renens
☛ 078 848 67 27
✉ info@nouvelles-perspectives.ch
🌐 nouvelles-perspectives.ch

16 Association Palabres

Atolye û cihêن sihbetê yên Frenşî.
⌚ Lausanne
✉ info@palabres.ch
🌐 palabres.ch

17 Bourse à travail

Kûrsên Frenşî.
⌚ Lausanne
☛ 021 323 77 15
✉ bourse.travail@gmail.com
🌐 la-bourse-a-travail.ch

18 Communauté Sant'Egidio

Kûrsên Frenşî.
⌚ Lausanne
☛ 078 641 08 33
✉ francais@santegidio.ch
🌐 santegidio.ch

19 CORREF

Kûrsên frenşî û hesabkirin.
⌚ Lausanne
☛ 021 341 71 11
✉ administration@corref.ch
🌐 corref.ch

20 ECAP Vaud

Kûrsên Frenşî.
⌚ Lausanne
☛ 021 320 13 27
✉ infovd@ecap.ch
🌐 ecap.ch/fr

[21] EPER

InfoSuisse 50+. Kûrsêñ Frensî
yên pratîk ji bo yên pîr.
 ☎ Lausanne
 Ⓛ 021 613 40 70
 @ info@eper.ch
 🌐 eper.ch/project-explorer/infosuisse-50

[22] Français en jeu

Kûrsêñ Frensî ji bo dêubavêñ ku dixwazin
fêri ziman bibin da ku baştir fam bikin ka
zarokêñ wan li dibistana Vaud çi dijîn.
 ☎ Lausanne
 Ⓛ 021 329 04 49
 @ lausanne@francaisenjeu.ch
 🌐 francaisenjeu.ch/cours/

[23] Lire et écrire

Ji bo mezinêñ bi pirsgirêkêñ nexwendewa-
riyê dersêñ xwendin û nivîsînê.
 ☎ Lausanne
 Ⓛ 021 329 04 48
 @ lausanneetregion@lire-et-ecrire.ch
 🌐 lire-et-ecrire.ch/vaud

[24] OSTARA

Kûrsêñ Frensî û tekniķêñ fêrbûnê
(*Brain Gym*) ji bo jinêñ koçber.
 ☎ Lausanne
 @ laure.caron@associationostara.ch
 🌐 associationostara.ch

[25] Pôle Sud

Kûrsêñ Frensî.
 ☎ Lausanne
 Ⓛ 021 311 50 46
 @ info@polesud.ch
 🌐 polesud.ch/activites-regulieres

[26] Université de Lausanne

Kûrsêñ betlaneyê (kûrsêñ Frensî
yên kûr wekî zimanekî biyanî).
 ☎ Lausanne
 Ⓛ 021 692 30 90
 @ coursdevacances@unil.ch
 🌐 unil.ch/cvac/en/home.html

[27] Université populaire de Lausanne

Kûrsêñ Frensî.
 ☎ Lausanne
 Ⓛ 021 315 24 24
 @ info@uplausanne.ch
 🌐 uplausanne.ch

**[28] Bureau lausannois pour les
immigrés (BLI) (Daîreya Koçberîyê
ya Lausanne) – Bajarê Lausanne**

Kûrsêñ fransî yên belaş di dema
havîn li Vidy-Plage.
 ☎ Lausanne
 Ⓛ 021 315 72 45
 @ bli@lausanne.ch
 🌐 lausanne.ch/vidy-plage

HERÊMA BAKÛR

29 Appartenances – Espace femmes Yverdon

Kûrsêñ Frenşî yên bi lénérîna zarokan ji bo zarokên di temenê pêşdibistanê de. Pêşwazîkirin, civîn û rênîsandina civakî ji bo jinêñ koçber ên bi zarok an bê zarok.
 ☎ Yverdon-les-Bains
 ☎ 024 426 03 36
 @ efyverdon@appartenances.ch
 ® appartenances.ch

30 Caritas Vaud

Kûrsêñ Frenşî yên bi lénérîna zarokan ji bo zarokên di temenê pêşdibistanê de.
 ☎ Yverdon-les-Bains
 ☎ 024 425 32 48

Kûrsêñ Frenşî
 ☎ Orbe, Chavornnay
 ☎ 079 289 10 88
 @ coursdefrancais@caritas-vaud.ch
 ® caritas-vaud.ch/nos-prestations/
 formations/cours-de-francais

31 CISEROC

Atolyeyêñ ji bo pékguhartin û parveki-
 rîna serpêhatiyêñ jiyanê, bi Frenşî.
 ☎ Orbe
 ☎ 079 289 10 88
 @ ciseroc@orbe.ch
 ® orbe.ch/ma-ville/integration/ciseroc

32 Şaredariya Yverdon-les-Bains

Kursêñ Frenşî di havînê de li gel
 lénérîna biroj têne pêşkêş kirin.
 ☎ Yverdon-les-Bains
 ☎ 024 423 69 44
 @ integration@yverdon-les-bains.ch
 ® yverdon-les-bains.ch/vie-quoti-
 dienne/cohesion-sociale/integration

33 Şaredariya Payerne

Kûrsêñ Frenşî bi lénérîna zarokan
 ji bo zarokên di temenê pêşdibis-
 tanê de û atolyeyêñ sihbêtê.
 ☎ Payerne
 ☎ 026 662 68 68
 @ helene.lelievre@payerne.ch
 ® payerne.ch/controle-habitants-
 bureau-étrangers/cours-de-francais

34 Commission d'intégration d'Avenches

Kûrsêñ Frenşî.
 ☎ Avenches
 ☎ 026 675 51 21 | 026 676 72 19
 @ integration@commune-avenches.ch
 ® commune-avenches.ch

35 ECAP Vaud

Kûrsêñ Frenşî.
 ☎ Yverdon-les-Bains, Le Sentier
 ☎ 021 320 13 27
 @ infovd@ecap.ch
 ® ecap.ch/fr

36 Français en jeu

Ji bo dêûbavêñ ku dixwazin fêrî ziman
 bibin da ku çêtir fêm bikin ka zarokên
 wan li dibistana Vaud ci dijîn.
 ☎ Moudon, Lucens
 ☎ 021 552 44 03
 ☎ Penthalaz
 ☎ 021 552 44 06
 ☎ Échallens
 ☎ 021 552 44 06
 @ gdv@francaisenjeu.ch
 ® francaisenjeu.ch/cours

37 Le pont du savoir

Atolyeyêñ pékguhartin û par-
 vekirina serpêhatiyêñ jiyanê, bi
 Frenşî, ji bo jinêñ koçber.
 ☎ Yverdon-les-Bains
 ☎ 078 661 31 93

38 Lire et écrire

Ji bo mezinêni bir pîrsigirêkên nexwendewariyê dersêni xwendin û nîvisinê. Hişyariya zarakan ji bo zarokêni di temenê pêşdibistanê de.

Yverdon-les Bains.

- ⌚ Yverdon-les-Bains, Orbe,
- Le Sentier, Payerne, Lucens,
- Moudon
- ⌚ 024 426 15 29
- @ nordvaud@lire-et-ecrire.ch
- 🌐 lire-et-ecrire.ch/vaud

39 Passerelle

Qada pêşwaziyê ji bo hemî jinêni koçber ên bi zarok an bê zarok ji bo praktîka Frenşî.

- ⌚ Le Sentier
- ⌚ 077 434 77 02 | 078 707 97 01
- @ passerelle.valleedejoux@gmail.com
- 🌐 gamvj.wordpress.com

40 Tisserands du monde

Kûrsêni Frenşî bi lénérîna zarakan ji bo zarokêni di temenê pêşdibistanê de.

- ⌚ Yverdon-les-Bains
- ⌚ 076 239 71 83
- 🌐 tisserandsdumonde.ch

41 Verso

Kûrsêni Frenşî.

- ⌚ Yverdon-les-Bains
- ⌚ 024 420 10 45
- @ info@verso-yverdon.ch
- 🌐 verso-yverdon.ch

ZAPADNA ZONA**42 Association Bienvenue**

Kûrsêni Frenşî bi lénérîna zarakan ji bo zarokêni di temenê pêşdibistanê de.

- ⌚ Crissier
- ⌚ 079 453 45 79
- @ a-bienvenue@hotmail.com
- 🌐 association-bienvenue.com

43 Association Franc-parler

Kûrsêni Frenşî.

- ⌚ Renens
- ⌚ 021 634 69 63
- @ info@franc-parler.ch
- 🌐 franc-parler.ch

44 Association Nouvelles perspectives

Rojêni şemiyê kûrsêni Frenşî û atolyeyên sihbetê.

- ⌚ Morges, Chavannes-près-Renens
- ⌚ 078 848 67 27
- @ info@nouvelles-perspectives.ch
- 🌐 nouvelles-perspectives.ch

45 CARITAS Vaud

Kûrsêni Frenşî bi lénérîna zarakan ji bo zarokêni di temenê pêşdibistanê de.

- ⌚ Nyon
- ⌚ 079 621 43 93
- ⌚ Gland
- ⌚ 079 621 43 93
- @ info@caritas-vaud.ch
- 🌐 caritas-vaud.ch/nos-prestations/formations/cours-de-francais

46 Şaredariya Cossonay

Kûrsêni Frenşî bi lénérîna biroj.

- ⌚ Cossonay
- ⌚ 021 863 22 00
- @ secretariat@cossonay.ch
- 🌐 cossonay.ch/social-et-sante/cours-de-francais

47 Şaredariya Nyon

Kûrsên Frensî li ber avê û kûrsên

Frensî yên herwe di havînê de.

⌚ Nyon

⌚ 079 211 02 74

@ integration@nyon.ch

🌐 nyon.ch/integration

48 ECAP Vaud

Kûrsên Frensî.

⌚ Nyon

⌚ 021 320 13 27

@ infovd@ecap.ch

🌐 ecap.ch/fr

49 Français en jeu

Kûrsên Frensî.

⌚ Morges

⌚ 021 552 44 02

⌚ Renens, Prilly

⌚ 021 552 44 04

Dersên Frensî yên destpêkî ji bo
dêubavênu ku dixwazin fêrî ziman bibin
da ku çêtir fam bikin ka zarokên wan
li dibistana Vaud ci tecrûbe dikin.
Kûrsa pêşvebirina zimanê nivîskî.

⌚ Renens, Écublens

⌚ 021 552 44 04

@ uest@francaisenjeu.ch

🌐 francaisenjeu.ch/cours

50 Globlivres

Atolyeyêne pêkguhartin û parvekirina
serpêhatiyan bi Frensî bi lînêrîna zarakan
ji bo zarokên di temenê pêşdibistanê de.

⌚ Renens

⌚ 021 635 02 36

@ info@globlivres.ch

🌐 globlivres.ch

51 Lire et écrire

Ji bo mezinêni bi pirsgirêkên

nexwendewariyê

dersên xwendin û nîvisînê.

⌚ Prilly, Renens, Écublens

⌚ 021 329 04 48

⌚ Morges, Nyon, Rolle

⌚ 022 366 34 04

@ lacote@lire-et-ecrire.ch

🌐 lire-et-ecrire.ch/vaud

52 Şaredariya Rolle

Kûrsên Frensî.

⌚ Rolle

⌚ 079 449 70 06

@ edith.norwell@bluewin.ch

🌐 rolle.ch

53 OSTARA

Kûrsên Frensî û tekniikên fêrbûnê (Brain
Gym) ji bo jînêni koçber bi lînêrîna zarakan
ji bo zarokêni di temenê pêşdibistanê de.

⌚ Renens

🌐 associationostara.ch

NOT

3 KAR

3.1 ŞERTÊN GIHÎŞTINA BAZARA KAR	28
3.2 BERÎ DESTPÊKIRINA KAR	30
3.3 KAREK MIN HEYE	33
3.4 HEKE MIN KARÊ XWE WENDA KIR	36

Mrs. Paula Barry

Career Objectives

Seeking a position where I will have the opportunity of working in creative, dynamic and fast-moving environment, improving and using all the personal and educated knowledge that not only increase the fiscal viability of the organization, but better my career prospects as well.

Experience

Current Employer
Position Held
Period of Service
Responsibilities

: Vero PR Company, HCMC
: Account Executive & Account Manager
: September 2011- Present

- : Worked as Account Executive for 3 months and now is an Account Manager
- : Successfully worked with colleagues to organize the company's networking event in Ly's Club on March 1st, 2012 with the participation of more than 250 guests and collected valuable database
- : Building client relationships to assigned accounts
- : Providing constant leadership in servicing clients day-to-day and team to handle day-to-day account servicing & dealing with clients
- : Developing PR strategy planning and over-all project management
- : Pitching interesting stories to send to mainstream & target media

: Maison Joint Stock Company, HCMC
: PR/Marketing Intern
: October 2010- April 2011

Interned for 3 months as PR/Marketing Manager Assistant and worked Marketing Specialist for 4 months.
Worked in the busy PR/Marketing Department, covered all the aspects of PR & Advertising activities. Involved in assistance, assessment and recommendation to colleagues, kept contact and informed with the journalists of 10 most famous magazines in Vietnam.
Sponsored the Creative Strategy Plan to push the sale of all 10 fashion brands for the whole 2011.
Created the Creative Concept for the fashion show of Charlton & Charles Collection 2011.
Successfully managed the Fashion Show of Mingo & Charles Collection 2011.
Finally worked with PR/Marketing work members to help the transportation Event 2010 at Vietnam in November 2010, which all the functions of logistics.



3.1 ŞERTÊN GIHÎŞTINA BAZARA KAR

BI KURTÎ

Hebûna destûra rûniştinê bi tenê mafê xebatê li Swîsreyê nadî. Şertên gihîştina bazara kar li gorî destûra rûniştinê û welatê jêderê diguhere.

Her kesê biyanî yê ku xwedîyê destûra rûniştinê ya ku di çarçoveya hevgîhîna malbatê de hatî dayîn e, dikare çalakiyeke bikêr birêve bibe.

→ Welatiyê YE û EFTA

Welatiyên Yekîtiya Ewropî (YE) û Sazûma-na Bazirganiya Serbest a Ewropî (EFTA) çi gava hatina xwe ji bo ofisa Contrôle des Habitants ya şaredariya xwe ya niştecîbûnê ragihandin, dikarin di prensîbê de kar bikin.

ŞERTÊN TAYBET ÊN LI SER PENABERIYÊ

Ji bo zêdetir şertên taybet ên gihîştina bazara karî wek hin destûrên ku bi penaberiyê ve girêdayî ne, hûn ê li jêr zanyariyên pêwîst bibîrin.

→ Destûra F

Ji 1ê Rêbendana 2019an û vir ve, kesên xwedî destûra F bi şertê ragihandina çalakiyê ji rayedaran re, girêdayî an negirêdayî dikarin çalakiyeke bikêr bikin, kar û karbenda xwe biguherînin. Qanûndanerê bi rastî nirxand ku pêwîst bû ku astengiyên rêverbîriyê yên li pêsiya gihîştina wan a bazara kar ji holê bêr rakirin û prosedûra destûrê ya berê bi ragihandineke hêsan a çalakiya wan were guhertin.

→ Destûra N, belavoka serlêdana penaberiyê

Her çalakiyeke karbendî bi şertê daxwaza destûrê ve girêdayî ye. Destpêkirina kar tenê piştî bîryara erêmî ya fermî ya Direction générale de l'emploi et du marché du travail (DGEM) pêkan e.

Çi gava kesê di prosedura penaberiyê de ji bo kantonekê were veqetandin (ü ji navenda federal derkeve), di bin hin şert û mercan de pêkanîna çalakiyeke pêkan dibe. Divê li gorî müçe û şertên kar ên asayî tevbigerin; divê wergirtina kar a penaberîkî ne li diji pêşaniya ku bi qanûnê ji bo karkerên jin û karkerên herêmî (Swîsreyî an biyaniyên ku li Swîsreyê dijîn) û welatiyên Yekîtiya Ewropî hatiye dayîn be.

Kanton her wiha mafê sînordarkirina çalakiya penaxwazan ji bo hin besên aborî parastî digirin.

Peyman dikare di çarçoveya peymaneke demekî ne diyar de pêk were. Lîbelê, heke serlêdana penaberiyê hatibe redkirin, dê were sekinandin.

Çi gava biryareke neyînî ya li ser serlêdana penaberiyê bikeve rewacê (ferz be), êdî destpêkirin an domandina çalakiyeke bikêr ne pêkan e. Heke ew di karekîde bin, divê di dawiya heyama derketinê ya ku ji hêla Konfederasyonê ve hatî destnîşan kirin de dev jê berdin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

 1.1 Kar, xwendin, beşdarbüna
endamekî malbatê

Ji bo ku hûn şertên gihîştina bazara karî li gorî destûra rûniştina xwe bibînin, hûn dikarin serî li Rêbernameya Kar ya li ser lînka ïnternetê ya jérîn de bidin.

ŞERTÊN GIHÎŞTINA
BAZARA KAR LI GORÎ
DESTÛRA RÛNÎŞTÎNA WE

 vd.ch > Thèmes >

Population > Intégration
des étrangers et prévention du
racisme > Publications du BCI



3.2 BERÎ DESTPÊKIRINA KAR

LÊGERÎNA KAR

Hin rêyên bidextxistina karekê li Swîsreyê hene. Bicîhanîna çalakiyeke bi muçe bi giştî prosedurên pêşîn ên wekî naskirina perwerdeya we û tecrûbeya karbendî ya ku li welatê we yê jêderê hatiye bidestxistin hewce dike.

Heke hûn li kantona Vaud li kar digerin, hûn dikarin:

- ➡ Bersiva pêşniyarên kar ên li ser ûnterê an di rojnameyan de bidin.
- ➡ Dosyayeke «serlêdana ne hatî xwes-tin» ji şirketênu ku we eleqedar dikin re bişînin. Hûn dikarin navnîşanên şirketan li ser swissfirms.ch bibînin.
- ➡ Li ajanseke peydakirina kar ku dê wekî navbeynkar ji bo karêñ demkî tevbigere qeyd bibin (hûn ê wan li ser malpera swissstaffing.ch bibînin).

ZÊDETIR AGAHDARÎ

- 5.3 Pergala sê-stûnî û sigorteya bêkariyê

♀ ŞÊWIR

Her weha lêgerîna nasen xwe ji bir nekin: 5% ji mirovan bi saya tora xwe ya civakî li Swîsreyê kar dibînin.

DOSYA SERLÊDANEÊ

Ji bo bersivdana pêşniyarek kar, pir kar-sazên Swîsreyî dê ji we bixwazin ku hûn ji wan re «dosya ya serlêdanê» bişînin ku tê de belgeyên jêrîn hene:

- ➡ Nameyeke pêşber;
- ➡ Kurtejiyana we (CV);
- ➡ Kopiyeke diploma û sertifîkayêñ perwerdehiya we;
- ➡ Kopiyeke sertifîkayêñ we yên kar.

Heke dosya we bala wan bikşîne, ew ê paşê ji bo yek an çend hevpeyivînên kesane bi we re têkilî daynin.

DÎTINA KARBENDEK LI GEL GIHÎŞTINA WE

Office cantonal d'Orientation Scolaire et Professionnelle (OCOSP), bi Navendêñ Herêmî yên xwe, entegrasyona karben-dî û karbarîtiya hemî mirovan, temen û perwerdehiya wan çi be bila bibe, pêşve dixe. Ew di pêvajoya avakirina projeyeke karbendî ya li Swîsreyê de nirxandinan, gelek agahdarî û piştgirî ji bo serlêderan pêşkêş dike.

CENTRES REGIONAUX
D'ORIENTATION
SCOLAIRE ET
PROFESSIONNELLE

🌐 vd.ch > Thèmes >
Formation > Orientation > Contact
et adresses de l'OCOSP et
des Centres d'orientation



RÊBERÎ JI BO KESÊN
NÛ HATINE

🌐 vd.ch > Thèmes >
Formation > Orientation >
Pour les personnes
arrivées récemment dans
le canton de Vaud



Portala agahdariyê ji bo rêberiya pîşeyî,
akademîk û kariyeré hemî zanyariyên li ser
şagirt, pîse û perwerdehiyê berhev dike.

ZÊDETIR AGAHNDARÎ

🌐 orientation.ch

**QEBÜLKIRINA DÎPLOMAYÊN
BIYANÎ Û SERTÎFKAYÊN KARBENDÎ
JI BO MEZINAN (CPA)**

Berî ku hûn li Swîsreyê dest bi kar bikin,
hin gav hene dibe ku hûn bicîh bînîn da ku
perwerdehî an tecrûbeya ku li welatê we yê
jêderê hatîye bidestxistin were qebûl kirin. Li
Swîsreyê, tê gotin ku hin karbendi têن «nû-
sazkirin». Wateya vê ew e ku pêkanîna van
karbendan sernaveke fermî ya naskirî hewce
dike. Wek mînak di rewşen bijîşkî, hemşîretî,
perwerdehiyê de, heke hûn bixwazin kar
bikin qebûlbûna dîplomayêne we mecbûrî ye.

We li derveyî welat xwendîye û hûn dixwazin
bîzanîn ka dîplomaya we li Swîsreyê tê nas
kirin? Zêdetir agajdarî li Secrétariat d'État
à la Formation, à la Recherche et à l'Inno-
vation (SERI) bîbînin.

SEH BIKIN KA DÎPLOMA

WE LI SWÎSRE TÊ

QEBÜL KIRIN

🌐 sbfi.admin.ch >

Formation >

Reconnaissance de diplômes étrangers >

Reconnaissance et autorités

compétentes > Professions réglementées et notes informatives



Mezinên xwedan tecrûbeya karbendî ya
çend salan di pîşeyeke ji cûreya CFC an
AFP de xwedî derfeta bidestxistina ser-
navê dawiya perwerdehiyê ne ku bi du
awayan prosedura jêhatîbûnê ji bo mezi-
nan bisopînin:

- An bi ihtimala wergirtina kûrsên amade-
kariyê dê bikeve ezmûna qedandina
şagirtiyê.
- An jî bi şopandina pêvajoyeke ji bo
pejirandina perwedeya berê (VAE). Ev,
peşvexisitina dosyayeke portfoliyoyê
ku wan jêhatîbûnên peywendifdar ên ku
bi profila jêhatinîyên pîşeya armanckirî
re têkildarin ku ji piştgiriya kolektif û
kesane sûd werdigire, digire nav xwe.

Her wiha, li ser bingeha kûrsa we ya
perwerdehiyê, mimkin e ku hûn karibin
perwerdehiyeyeke profesyonel a demkurt
bisopînin.

SERTÎFKAYÊN PROFESYONEL

BO MEZINAN (CFC, AFP)

Office cantonal d'orientation scolaire
et professionnelle (OCOSP)

📞 021 557 88 99

✉️ info.cpa@vd.ch

🌐 vd.ch/certification-adulte

ENTEGRASYONA KARBENDÎ

Gelek sazûmanan ji bo koçberan projevênt integrasyona karbendî çêkirine. Ev pêşniyar dikarin di légerîna we ya kar an perwerdehiyê de ji we re bibin aîkar. Hin ji wan li ser portala "Bi xér hatî kantona Vaud" hatine liste kirin.

SAZÛMANÊN
ENTEGRASYONA
KARBENDÎ

✉ vaud-bienvenue.ch >
Travail



DILXWAZÎ

Li gel berfirehkirina qada jêhatîn û tora we, dilxwazî dikare bibe pékolek ji bo bidestxistina karekî bi heq. Heke hûn dixwazin hefteyê çênd saeten ji bo sedemeke ku ji we re hêja ye an ji sazûmanekâ avabikin, hûn dikarin pirsyara énévolat-Vaud bikin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

Bénévolat-Vaud, Centre de compétences pour la vie associative

- 📍 Avenue Ruchonnet 1
1003 Lausanne
- 📞 021 313 24 00
- ✉ info@benevolat-vaud.ch
- 🌐 benevolat-vaud.ch

॥ 10 Slobodno vreme i društveni život

TEDBÎRÊN SÎGORTEYA BÊKARIYÊ YA ENTEGRASYONA KARBENDIYÊ

Di bin hin şert û mercan de, tedbîrên integrasyonê yên karbendî ji bo kesên ku li herêma xwe di Navenda Kar a Herêmî (ORP) qeydkirî ne û ji wan re mafê tezmînata sîgorteya betaliyê hatiye dayîn, li bedrest in.

AFIRANDIN Û PÊŞVEBIRINA KARSAZÎ

Kantona Vaud çarçoveyeke cazib ji bo afirandin û pêşvebirina karsaziyan pêşkêş dike. Service de la Promotion de l'Economie et de l'Innovation (SPEI) rêberiya karsazan di hewildanêwan de dike û li gorî hewcedariyêwan berafî dike réexistinêrewa (şêwir, finans, piştgiriya teknolojik, hwd.). Piştgiriî ji bo şîketên ku di sektorêndustriyê û teknolojiya bilind de çalak in peydâ dibe.

SERVICE DE LA PROMOTION DE L'ÉCONOMIE ET DE L'INNOVATION (SPEI)

- 📍 Rue Caroline 11
1014 Lausanne
- 📞 021 316 60 21
- ✉ info.spei@vd.ch

Chambre vaudoise du commerce et de l'industrie (CVCI) xizmeta şêwira afirandina kar pêşkêş dike.

CHAMBRE VAUDOISE DU COMMERCE ET DE L'INDUSTRIE (CVCI)

- 📞 021 613 35 35
- ✉ creation@cvci.ch
- 🌐 cvci.ch Services > Entreprendre en pratique > Création d'entreprise

DÎTINA ÇARESERİYEKE BI LÊNÊRÎNA ZAROKAN

Gava li karekî digere, ji dêübav re pêdîvîye ku çareseriyeke bi Lênêrîna zarokan hebe.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

॥ 7.1 Berî dibistanê

3.3 KAREK MIN HEYE

33

BI KURTİ

Çalakiya karbendî li gorî maf û erkan e. Şer-tên kar, erkên bacê û peymanên kedê yên kolektif di ewil de tevlîhev xuya dikin. Ew bi rastî ji ya ku xuya dike hêsanter têne fêm kîrin ûzanîna wan girîng e. Li vir hûn ê hûrgiliyênu kû hûn lê digerin bibînin.

PEYMANA WERGIRTINA KAR

Çi gava kardêrek bîryar dide ku we wergire kar, ew ê peymaneke kar bi we bidin îmze bikin. Her çiqas peymana kar bi devkî were girêdan ji, li Swîsreyê pratîk ew e ku peymaneke nivîskî ji were îmze kîrin. Di her rewşê de, şert û mercen wergirtina kar (maweya peymanê, dema xebatê, mîqdarê müçeyê salane, cûreyê karê ku dê were kîrin, jêbirînen civakî, saetê kar, betlane, heyama ceribandinê û heyama agahdarkirinê, hwd.), divê berî destpêkirina çalakiya weya karbendî werin nîqaş kîrin.

MÛÇE

Li Swîsreyê, asta müçeyan li gorî sektora çalakiyê û herêmê gelek diguhere. Ew bi awayekî şexsî yan ji komî têne nîqaş kîrin. Qanûna Swîsreyê müçeyê herî kêm diyar nake: rîjeya müçeyê axleb di dema wergirtina kar de di navbera kardêr û karker de li hev tê kîrin.

Lêbelê, hin peymanen wergirtina kar ên kolektif û peymanen kar ên standard ji bo hin kategoriyen pîşeyan müçeyen herî kêm ên mecbûrî dabîn dikin. Müçe di navbera kardêr û karker de li hev tê kîrin. Ew bi gelek faktoran ve girêdayî ye (tecrûbe, jêhatîbûn, herêm, hwd.). Rîjeya müçeyê mehane an saetê tête diyar kîrin. Müçe bi giştî di dawiya mehê de ji hêla kardêr ve bi réya şandina hesaba bankê an postayê tê dayîn. Girîng e ku hûn kontrol bikin ka müçeyê we şandiye hesaba we. Karmend di prensîbê de daxuya-niyeke müçeyê ya mehane werdigirin.

Di nav 3 mehan de piştî hatina we, divê hûn sigorteya tenduristiyê bistînin. Ev pêvajoya mecbûrî girîng e ji ber ku xizmetên bijîşkî li Swîsreyê biha ne. Bi karta xwe ya sigorteyê, hûn dikarin herin bijîşk an nexweşxaneyê û beşeke ji lêçûnên bijîşkî dê ji hêla sigorteya we ya tenduristiyê were vegirtin. Di heman demê de pêkan e ku mirov sigorteya tenduristiyê ya ne mecbûrî ya bi navê «Complémentaire» ku lêçûnên zêde vedigire ji bigire.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

 5.2 Sigorteya tenduristiyê

Ji bo hin şêwirdariyên pispor ên tedawiyê (fizyoterapî, terapiya karbendî, dermanên xwezayı) reçeteyeke ji bijîşkê we hewce dike ku ji hêla sigorteya tenduristiyê ya mecbûrî ve were vegirtin. Di bûyera razandina nexweşxaneyê de an guman li ser karûbârên ku têne vegirtin, ya herî baş ew e ku ewil li sigorteya tenduristiyê ya xwe kontrol bikin.



HIŞYARI

Lêçûnên çav û diranan ji hêla sigorteya tenduristiyê ve nayê vegirtin!

DÎTINA BIJİŞKEKÊ

Li Swîsreyê, bi gelempêrî «bijîşkê malbatê» ên welatiyan hene. Ew gelemperek e ku paşê li gorî hewcedariyên we dikare we ji pisporékê re bişîne. Ji bo ku hûn ji zarokê xwe re bijîşkek an bijîşkekî zarakan bibînin, hûn dikarin bi Société vaudoise de médecine (SVM) re têkilî daynin. Her weha hûn dikarin serdana malpera Fédération Suisse des Médecins FMH bikin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

Société vaudoise de médecine (SVM)

- ⌚ Chemin de Mornex 38
Case postale 7443 | 1002 Lausanne
- 📞 021 651 05 05
- ✉️ info@svmed.ch
- 🌐 svmed.ch

Hûn dikarin serdana malpera jêrîn bikin ku zimanê ku ji hêla bijîşkan ve têr axaftin diyar dike.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

Société vaudoise de médecine (SVM)

- 🌐 doctorfmh.ch

⌚ ŞÊWIR

Dibe ku bijîşkê we yê malbatê li gorî sigorteya ku hatiye girêdan were ferz kîrin an ji divê ji navnişeke bijîşkên ku ji hêla sigorteyê ve hatiye amadekirin, were hilbijartin. Bijîşkê malbatê yê bijartî wê gavê berpirsiyarê şopandina bijîşkî ya kesen bi sigorte ye ku wî an wê hilbijartiye. Dûvre ew dikare we li gorî hewcedariyên we bişîne cem pisporékê. Her weha dibe ku hûn neçar bibin ku ji bijîşkekî gelempêrî derbas bibin heke hûn bixwazin ji hêla sigorteyê ve bê vegirtin.

DI REWSA PIRSGIRÊKEKE TENDURISTIYÊ DE ÇI TÊ KIRIN?

1. Têkilî bi bijîşkê xwe re daynin

Çi gava we bijîşkê malbatê hebe, ew ê bibe kesê ku di bûyera nexweşî, qezayeke giran an ji tengasiya psikolojik de pê re têkilî bê danîn. Her wiha hûn dikarin bi dermansazê xwe re şêwir bikin. Hûn ê bi kesê ku we herî baş nas dike û dikare rewşa tenduristiya we û lênihêrîna we organize bike re biaxivin.

2. Bi navenda lêgerinê re têkilî daynin

Heke we bijîşkek nebe an ji ew bersiv nede, navenda telefonê ya bijîşkén nobedar 24 saetan li ser **0848 133 133** (xeta herêmî) bersiv dide. Ev hejmar li seranserê kantonâ Vaud derbasdar e. Navenda telefonê ji pisporên tenduristiyê (hemşîre) yên ku bi taybeti ji bo bersîvdana telefonan hatine perwerde kirin, tên xebitandin. Yek ji wan dê rewşa we binirxîne, ji we re şêwir bide û we ber bi cihê herî rewa ve bişîne. Serde ji, ev pispor dê bikarin bi çend zimanân bersiva we bidin.

3. Bi Centre médico-social re têkilî daynin

Heke hûn nikarin ji mala xwe derkevin, Centre médico-social (CMS) li hemû herêmîn kantonê lênhêrîna bihemşîre, gjihandina xwarinê bo malê û alîkariya lênhêrînê pêşkêş dike.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

Association vaudoise d'aide et de soins à domicile (AVASAD)

- ⌚ Avenue de Chavannes 37
1014 Lausanne
- 📞 021 623 36 36
- ✉️ info@avasad.ch
- 🌐 avasad.ch

♀ ŞÊWIR

Heke hewce be kesek bi were be gava diçin blişk, diransaz, nexweşxane an navendê, hûn dikarin serî li xizmeta veguhastinê ya Xaça Sor a Vaudê bidin. Dilxwaz wesayîta xwe ya şexsî berdest dîkin û hûn dikarin hemî rojan li wan bigerin. Di heq rê de mîktarek ji bo wergirtinê heye û dûv re li gorî dûrahiya rêuwiyan tê hesibandin.

🌐 croixrougevaudoise.ch > J'ai besoin d'aide
 > Transports de personnes à mobilité réduite

4. Bi xizmetên acîl re têkilî daynin

Di rewşeke acîl a xeternak de, jimareya ku tê lêgerin 144 (ambulans) e. 144 ji bo rewşen awarte yên xeternak ên jîyanê vegetandî ye. Heke jîyana we an ya kesen din di xetereyê de be û pêdivî bi têkilbûna bijîşkî û tenduristî ya bilez hebe divê were lêgerin. Heke ew acîl be lê hûn dikarin tevbigerin, divê hûn biçin nexweşxaneya herî nêzîkî mala xwe.

Ji bîr nekin ku servîsên acîl mecbûr in ku hemî mirovén di rewşen awarte yên xeternak de tedawî bikin ferq nake ku wan dahatek an sîgorteya tenduristiyê hebe.

MAFÊN DÊÛBAVAN

Ji bo şêwirmendiyê li ser prosedurên têkil-darî tenduristiyê an di bûyera nakokiyek bi terapîst an şirketa sîgorteyê re.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

Organisation suisse des patients (OSP)

- 🌐 CHUV | Chemin de Mont-Paisible 18
 1011 Lausanne
- 📞 021 314 73 88
- 🌐 spo.ch

AGAHDARIYA PIRZIMANÎ YA TENDURISTIYÊ

Malpera Xaça Sor a Swîsreyê di warê tenduristiyê de gelek agahdarî û broşûrên bi 18 zîmanan yên têx daxistin pêşkêş dike. Ji bo zêdetir agahdarî, herin malpera:

🌐 migesplus.ch/fr

Broşüreke ku têde “bingehêñ mafêñ nexweşan” têx pêşkêş kirin, bi kurtasiya bi çend zîmanan heye, rûpela jêrîn bibînin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

- 🌐 vd.ch > Santé, soins et handicap >
 Patients et résidants: droits et qualité de soins > Les droits des patients

TIRYAK

Navenda Şarezatiya Neteweyî

ya di warê tiryakê de

Pirsgirêkên tiryakê yên bi madeyan (tütin, alkol, derman an narkotik) an bêyi madeyan (hipertekili, qumar û nesaxiyên xwarinê) dikare bandorê li hemî nifûsa li Swîsre bike. Portala tiryakê ya Swîsreyê ji bo kes û malbatênu ku ji her pirsgirêkeke tiryakê dikişînin alîkariyê pêşkêş dike.

addictionsuisse.ch

PÊŞVEBIRINA TENDURISTIYÊ

Unisanté

Unisanté, navenda dermanên giştî û tenduristiya giştî li Lausanne, di nav tiştên din de, şiretan li ser pêşvebirin û pêşilégirtinê di derbarê tenduristiya rûniştevanan kantonâ Vaud de pêşkêş dike. Ev agahdarî li ser malpera saziyê heye û bi taybetî bi xwarin, çalakiya fizîkî, cigare û tenduristiya cinsî ve girêdayî ye. Ji bo nexweşiyên dil û damar, kansera bersing û kolonê jî muayenê pêşkêş dike.

[> Promotion prévention](http://unisante.ch/fr)

HEJMARÊN ACÎL

Polîs

117

Agirkuj

118

Ambulance

144

Jehribûn

Tox Info Suisse – Navenda Swîsreyê ya Agahdariya Toksîkolojîk

145 ou 044 251 51 51

Ciwanî

Pro Juventute – Xeta alîkariyê ji bo zarok û ciwanan

147

Bijîşkêن nobedar

0848 133 133 (xeta herêmî)

Xeta alîkariyê

La Main Tendue – Xeta telefonê ya 24 saetan ji bo kesenê ku hewceyî alîkarî û piştgirîyê ne

143 (0,20 CHF her bang)

Tundi

Centre d'accueil MalleyPrairie – Şêwîrmendiya pispor a 24 saetan

li ser tundiya nav malê

021 620 76 76

Rizgarkirina hewayî

Rega

1414

6.2 DÊÜBAVÎ Û JIDAYIKBÛN

BERÎ WELIDANDINÊ

Di wextê ducaniyê de, jinekolojist û/an ji pîrik çavdêrî û şêwirmendiya ducaniyê dîkin. Mesrefên têkildar ji hêla sîgorteya tenduristiye ve têne vegirtin. Ji bo dîtina yekê, hûn dikarin bi civata bîjîşkî ya Vaud an koma pîrikên serbixwe yên Vaud re têkili daynin.

Xetêñ telefonê

Xeta telefonê bi pîrikên serbixwe yên
Vaudê (10 berî nîvro-6 piştî nîvro – 24/7)
☞ 021 213 79 05
✉ votresagefemme.ch

Pîrikên serbixwe

☞ hebamme.ch > Parents >
 Votre sage-femme >
 Sages-femmes indépendantes

Pisporêñ din ji li ber destê we ne ku berî û piştî welidandinê we agahdar bikin û şêwirmendiyê bidin we.

Fondation PROFA

Servîsên welidandinê yên nexweşxaneyêñ Vaud û weqfa PROFA bi şêwirmendiyeke tenduristiya zayendî, pîrik an xebatkarek cîvakî re li navendêñ cuda yên herêmî yên weqfa PROFA şêwirdariya nepenî û herwe pêşkêşî dêübavan dîkin. Ji bo ku navenda herî nêzîkî mala xwe bibînin, hûn dikarin bi telefonê xwe bigihîmin wan an serdana malpera wan bikin:

☞ 021 631 01 50
✉ profa.ch/cp

Association PanMilar

Sazûmana PanMilar bi saya hebûna tecimânên civatê kursêñ amadekirina welidandinê bi çend zimanen pêşkêş dike. Malpera wan ji bo zêdetirî 30 zimanen hatiye wergerandin.

☞ 077 410 20 24
✉ @ secretariat@panmilar.ch
🌐 pan-milar.ch

Association Appartenances

Sazûmana Appartenances kûrsêñ Frensî li ser temayêñ 3Dûcanî, Jidayikbûn û Savatî3 pêşkêş dike.

Espace Femmes Vevey

☞ Rue des Communaux 2A
 1800 Vevey
☞ 021 922 45 23
✉ ef.vevey@appartenances.ch

Espace Femmes Lausanne

☞ Rue des Terreaux 10, qata 4.
 1003 Lausanne
☞ 021 351 28 80
✉ ef.lausanne@appartenances.ch

PIŞTÎ WELİDANDINÊ

Ji bo lénêrîna dê û zarokê sava, pîrikên serbixwe yên Vaudê di tevahiya wextê ducaniyê de piştgirî û şêwirmendiyê didin we û gava ku hûn ji servîsa welidandinê vedigerin li malê şêwirmendiya we dîkin.

Hemşireyên zarokên sava ji AVASAD û Qada Pêşîlégirtinê dûv re di dema şêwîrmendiyên malê, civînên piştî welidandinê an atolyeyên/ kûrsên komê yên cûrbicûr de şêwir û agahdariyê pêşkêş dikin.

Heke hûn dixwazin di tevahiya wextê duca- niya xwe de, an ji piştî welidîna zarokê xwe ji piştgiriya kesane ya pîrik sôd werbigirin, hûn dikarin pîrikek nêzîkî xwe bibînin û pê re têkilî daynin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

- 🌐 votresagefemme.ch > Changer la zone > Pour le public > Rechercher une sage-femme



HIŞYARIÂ

Ji bîr nekin ku ji bo zarokê xwe ji ducaniyê heta meha sêyemîn piştî ji-dayîkbûnê sigorteya tenduristiyê bistînin

- ⌚ 5.2 Sigorteya tenduristiyê
- ⌚ 5.4 Sigorteya girêdayî dayiktî û zarakan

Hemşireyên zarokên sava

Heke hûn dixwazin piştî welidîna zarokê xwe ji seredana hemşireyeke zarokên sava ya AVASAD a malê sôd werbigirin, li gorî herêma ku hûn lê dîjîn bi tenê bi wan re têkilî daynin.

Rohilat Vaud

📞 021 925 09 80

La Côte

📞 021 804 66 40

Lausanne û herêma wê

📞 021 641 08 10

Bakûr Vaud-Broye

📞 024 420 31 15

🌐 avasad.ch

Espace Prévention

Navenda jêhatibûnê ya herêmî ku di warêne pêşvebirina tenduristî û pêşîlégirtinê de dixebite, bi taybet di warê zarokên sava de.

🌐 espace-prevention-lacote.ch

PanMilar

PanMilar piştî welidandinê li malê piştgirî dide malbatêñ koçber û ji malbatan re pîrik û wergêrek peyda dike. Ci gava ew vegeîn malêñ xwe, jinêñ ku jîxwe beşdarî dersêñ amadekirina welidandinê bûne, dê bikarin ji şopandina şexsî ya bi zimanê xwe sôd werbigirin da ku di vê heyama taybetî ya derbasbûnê de piştgiriye bidin wan.

📞 077 410 20 24

🌐 panmilar.ch > Post partum

Civin ji bo bavan û bavên pêşerojê

Sazûmana maenner.ch bi bernameya xwe ya MenCare Suisse romande ji bo dê û bavên pêşerojê û déûbavên nû – bi zarok(én) biçük re – civînan pêşkêşî dike ku destûradanûst-andina agahdarî û tecrûbeyên têkildarî hâtina zarok, rola wî wekî bav dide. (hevsengiya kar-jiyan, hwd.)

- ⌚ Route de Pierrefleur 63
1958 Uvrier
- ⌚ 078 874 46 08
- ✉ crettenand@maenner.ch
- 🌐 maenner.ch/fr/rencontres-pour-les-peres-et-futurs-peres

XWEŞÜBEŞÎ

Fondation PROFA

Jî bo şêwirmendî û şiretên li ser zayendî, régirtin ji ducaniyê, bidawîkirina ducaniyê, testên HIV/AIDS û STI (enfeksiyonên bi réya zayendî belav dibin) û homoseksueliyê, şêwirmendiya tenduristiya zayendî ya We-qfa PROFA li ber destê we ye. Şêwirmend û bijîşk bi randevûyê li heşt navendên herêmê yên kantonê pêşwaziya we dikin. Ev xizmet bi gelemeperî wekî plankirina malbatê tê binav kirin.

- ⌚ 021 631 01 42
- 🌐 planning-vd.ch

DESTEKA DERÛNÎ

Association Appartances – CPM

Sazûmana Appartances alîkariya psî-koterapî û derûnî ya pispor pêşkêşî kesên bi ezaba derûnî ya têkildarî koçberiyê û/ an serpêhatiya şer, îşkencekirin an tun-diyeyeke din a kolektifin dike. Ev şêwirmendiyên derûnî yên ji bo koçberan bi gelek zimanen hene.

Li sazûmanê sê navendên şêwirmendiyê li Lausanne, Vevey û Yverdon-les-Bains hene.

- ⌚ Rue des Terreaux 10
1003 Lausanne
- ⌚ 021 341 12 50
- ✉ cpm.lausanne@appartances.ch
- 🌐 appartances.ch

TUNDÎ

Yekîneya Bijîşkî ya Tundiyê CHUV

Jî bo her kesê êrîşeke rasterast li ser yek-parebûna laş, zayendî an psîkolojikî tecrûbe kiriye, Yekîneya Bijîşkiya Tundiye (UMV ya CHUV) şêwirmendiya bijîşkî-qanûnî û seqâkirina servîsên pispor pêşkêş dike.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

- ⌚ 6.3 Tundiya nav malê

DOBRO JE ZNATI

Za probleme u paru postoje informacije i specijalizovane telefonske linije.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

- Alîkarî û şêwirmendî ji bo hevjinan
- ⌚ 0840 860 860
- ✉ info@problemedecouple.ch
- 🌐 problemedecouple.ch

6.3 TUNDIYA NAV MALÊ

71

BI KURTÎ

Tundiya nav malê ji bo hemû kiryarên tundiya fizîkî, zayendî, derûnî an aborî yên ku di nav hevjinan an jî di nav malê de rû didin tê gotin. Bi qanûnê qedexe ye. Sûcdarê tundiyê dikare ji hêla polîs ve ji mala hevpar were derxistin û neçar bimîne ku hevpeyvîneke civakî-perwerdeyî bisopîne. Xizmetên piştgiriyê ji bo mexdûran şêwir, pêşwazî û cîhê biewle pêşkêş dikin û ji bo sûcdarênu ku dixwazin alîkariyê werbigirin jî şêwirmendî û bernameyan pêşkêş dikin.

ŞÊWIRMENDÎ JI BO MEXDÛRÊN TUNDIYÊ

Yekîneyên bijîskî yên tundiyê

Lausanne

CHUV Resepsiyona acîl

- ∅ Rue du Bugnon 44
1011 Lausanne
- ∅ 021 314 00 60
- 🌐 chuv.ch > UMV

UMV-Nyon

- ∅ Qata 3, 200 m ji stasyona trênen
Avenue Reverdin 8
1260 Nyon
- ∅ 021 314 08 51



HEJMARÊN ACÎL

Polîs

- ∅ 117

Acîliya bijîskî

- ∅ 144

UMV-Rennaz

Centre hospitalier de Rennaz HRC

Vaud-Valais, Prijem glavne zgrade

- ∅ Route du Vieux-Séquoia 20
1847 Rennaz
- ∅ 058 773 64 77

UMV-Yverdon-les-Bains

Centre hospitalier d'Yverdon-les-

Bains, Prijem glavne zgrade

- ∅ Rue d'Entremonts 11
1400 Yverdon-les-Bains
- ∅ 024 424 42 20

Fondation PROFA / Centres LAVI

🌐 profa.ch > Consultations > Centre LAVI

Lausanne

- ∅ Rue du Grand-Pont 2 bis
1003 Lausanne
- ∅ 021 631 03 00

Aigle

⌚ Rue du Molage 36
1860 Aigle
✉ 021 631 03 04

Yverdon-les-Bains

⌚ Rue de la Plaine 2
1400 Yverdon-les-Bains
✉ 021 631 03 08

Violencequefaire.ch

Malpera ku agahî bi dozdeh zimanan hatiye wergerandin, servîsa bersiva emaîlê ji bo mexdûrên tundiya nav malê, zewacêñ bi zorê ji di navde.

✉ violencequefaire.ch

Centre d'accueil MalleyPrairie

Bêyî ku li destûra rûniştinê bê nêrîn; xeta alîkariyê 24/7 ji bo mexdûrên şideta nav malê, zewacêñ bi zorê, hewandina acîl û şêwirmendiya tedavî ya li ser niga.

⌚ Chemin de la Prairie 34
1007 Lausanne
✉ 021 620 76 76
🌐 malleyprairie.ch
✉ info@malleyprairie.ch

Centre Prévention de l'Ale

Ji bo sûcdarêñ tundiyyê yên li alîkariyê digerin.

⌚ Rue de l'Ale 30
1003 Lausanne
✉ 021 321 24 00
✉ info@prevention-ale.ch
🌐 prevention-ale.ch

Bureau de l'égalité (BEFH)

Şêwirmendî û rêberî.

✉ 021 316 61 24
✉ info.befh@vd.ch
🌐 vd.ch/violence-domestique

Şideta nav malê û destûra rûniştinê

Mexdûrén şideta nav malê dibe ku ditirsin ku eger ew şidetek weha ragihînin an ji ji kiryarê wê cihê bibin, ew dikarin mafê xwe yê rûniştinê li Swîsreyê winda bikin. Ji bo piştgirî û şêwirdariyê li ser rewşa xwe ya koçberiyê, heger ku destûra we ya rûniştinê ya derbasdar tune be ji, hûn dikarin bi Centre Protestant Social (CSP) re têkilî daynin.

**CSP Vaud, La Fraternité,
Xizmeta Civakî ji bo Koçberan**

⌚ 021 560 60 98
✉ frat@csp-vd.ch

**HÛN BI METIRSIYA ZEWACA
BI DARÊ ZORÊ NE**

Şêwirmendiya herwe ji bo kesen di rewşa zewaca bi darê zorê de an jî bi zextên ji derdora wan re rû bi rû dimînjin ji bo dest-pêkirina an bidawîkirina têkiliyekê, şiret ji pisporêñ ku van kesan diparêzin.

**BUREAU CANTONAL
POUR L'INTÉGRATION
DES ÉTRANGERS ET
LA PRÉVENTION DU
RACISME (BCI)**

⌚ Avenue de Sévelin 46
1014 Lausanne
✉ 021 316 49 59
✉ info.integration@vd.ch
🌐 vd.ch/integration



7 DIBISTAN Û PERWERDE

7.1 PÊŞ-DIBISTAN	74
7.2 JI 4 HETA 15 SALÎ: DIBISTANA MECBURÎ Û LÊNÊRÎNA BIROJ JI BO ZAROKAN	76
7.3 JI 15 SALÎ PÊ VE	80
7.4 DÎTINA PERWERDEYÊ LÍ GEL GIHİSTİNÊ	81



7.1 PÊŞ-DIBISTAN

LÊNÊRÎNA ZAROKAN

Heke zarokên we yên biçûk hebin, hûn dikarin serî li navendeke lénêrîna zarokan/ kreş an jî li hawîrdora malbatê li kesekî dikare di dema çalakîyên we de (kar, lêgerîna kar, perwerde, kûrsa Frenstî, hwd.) li wan xwedî derkeve, bidin. Bihayê van xizmetan li gor dahata dê û bavan diguhere.

Jî kerema xwe bizanin ku cih bi sinor in û pir caran listeyeke li bendêbûnê heye. Tê pêşniyar kirin ku di dema ducaniyê de li agahdarî bigerin.

Di heman demê de çareseriyê lénêrîna malê jî hene: ev yek bi dîtina dayikeke biroj an au pair'ek (ku hûn bixwe dê bidin), ferq nake temenê zarokan çi be.

Lénêrîna zarokan li kantonâ Vaudê di nav toran de hatiye organizekirin. Hûn dikarin bi şaredariya xwe ya niştecihbûnê an jî bi torêl lénêrîna zarokan ên ku hatine rêt kirin re têkilî daynin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

- 🌐 faje-vd.ch/dispositifs/les-reseaux
- 🌐 vaudfamille.ch > VD > Garde d'enfants



CÛREYÊN CUDA YÊN

LÊNÊRÎNA ZAROKAN

- 🌐 vd.ch Thèmes > Population > Enfance, jeunesse et famille > Accueil de jour des enfants ou Accueil familial de jour des enfants

➡ Sereguhiya savayan û lénêrîna acîl

Hin caran, hûn dikarin li sexbêrê zarokên sava jî bigerin ku êvarê an dawiya hefteyê çend saetan lénêrîna zarokên we bikin. Xaça Sor ciwanan di warê lénêrîna zarokan de perwerde dike û li gorî dahata dawî ya malbatê li gorî van rîjeyê jérîn xizmetên alîkariya malbatan pêşkêş dike: 4 CHF serê saetekê jî bo dahata heta 3500 CHF û 6 CHF serê saetekê heke ew lénêrîna zarokan di şevêna nava hefteyê, dawiya hefteyê an betlaneyê de ye.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

- 🌐 croixrougevaudoise.ch > Prestations > Baby-sitting

➡ Xaça Sor a Vaudê

Di rewşa awarte de an jî heke zarokê we nexwêş be yan qezayek qewimî be, hûn dikarin ji bo lénêrîna zarokên xwe serî li xizmetên bipere yên Xaça Sor bidin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

Service de garde d'enfants malades

- ⌚ Rue Beau-Séjour 9-13
1002 Lausanne
- 📞 021 340 00 80
021 340 00 81
- ✉️ famille@croixrougevaudoise.ch
- 🌐 croixrougevaudoise.ch > Prestations > Garde d'enfants malades

📘 6.2 Dêûbavî û Jidayikbûn

ÇALAKIYÊN DÊÜBAV-ZAROK

Kûrsên Frensî li ser cîhana dibistanê ji dêûbavan re têne pêşkêş kirin.

Français en jeu

Kûrsa Frensî “Perwerdeya li dibistanê”

Lausanne

⌚ Place Pépinet 2
1003 Lausanne
📞 021 329 04 49
✉️ lausanne@francaisenjeu.ch

Rojavayê Vaud

⌚ Rue de l’Avenir 6
1020 Renens
📞 021 552 44 04
✉️ ouest@francaisenjeu.ch

Rojhilatê Vaud

⌚ Rue des Remparts 7
Case postale 47
1814 La Tour-de-Peilz
📞 021 552 44 05
✉️ riviera@francaisenjeu.ch

Broyes û Gros-de-Vaud

⌚ Rue Mauborget
1510 Moudon
📞 021 552 44 03
✉️ moudon@francaisenjeu.ch

Atolyeyên pêş-dibistanê ji zarokan re têne pêşkêş kirin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ
॥ 10 Dema vala û jiyana civakî

7.2 JI 4 HETA 15 SALÎ: DIBISTANA MECBÛRÎ Û LÊNÊRÎNA BIROJ JI BO ZAROKAN

BI KURTÎ

Li Swîsreyê dibistanjî temenê 4 pê ve mecbûrî ye û 11 sal berdewam dike. Hemû zarok, ferq nakek rewşa wan a rûniştinê çi be, di dibistanê dewletê yêن li kantona Vaud de, ku herwe ne, têن qebûl kirin. Di vê çarçovveyê de, xwendekarêن ku Frensi nizanîn dêjî kûrsêñ kûr û bêpere jî sôd werbigirin.

Li gel gihiştina we, heke zarokêñ we yêñ di temenê dibistanê de hebin, divê hûn wan di zûtiyîn dem de li dibistana herî nêzîkî mala we qeydbikin.

SERÎ LI RÊVEBERIYA

DIBISTANÊ BIDIN

- 🌐 vd.ch > Autorités > Département de la formation, de la jeunesse et de la culture (DFJC) > Direction générale de l'enseignement obligatoire (DGEO) > Liste et contacts des établissements scolaires



Ji bo qeydên li bajarê Lausanne, divê hûn rasterast bi Service Ecoles et du Parascolaire re têkîlî daynin.

ZÊDETIR AGAHDARI

Service des écoles et du parascolaire

Direction de l'enfance, de la jeunesse et des quartiers

- 📍 Place Chauderon | qata 5
Case postale 5032 | 1002 Lausanne
- 📞 021 315 64 11
- 🌐 lausanne.ch/service-ecoles-parascolaire

Ji bo zêdetir agahdarî, hemî belgeyêna ra-vekirina pergala dibistana Vaudê ya ku bi 16 zimanîn hatine wergerandin, bişopînin.

BELGEYÊN AGAHDARIYA

WERGERANDÎ JI BO

DÊÜBAVAN

- 🌐 vd.ch > Thèmes > Formation > Scolarité obligatoire >
Les élèves qui parlent une autre langue (allophones)



Hûn ê her weha diyagraman li gorî welatan bibînin ku pergala Vaud bi pergalêñ welatêñ cûda re tê berhevdan hevber kirin.


JI BO HEMÛ PIRSÊN TÊKIRIN

BI DIBISTANÊN MERCÎ

- 🌐 vd.ch > Thèmes > Formation > Scolarité obligatoire

KÛRSÊN FRENSÎ Û SEFÊN PÊŞWAZIYÊ

Li gorî şaredariya xwe ya niştecihbûnê, zarakîn ku Frensi nizanîn di sefêñ berdewamî de bi kûrsêñ Frensi yêñ kûr an sefêñ pêşwaziyê yêñ tam-dem têne entegre kirin. Pişti salek an du salan xwendekarêñ di sefêñ pêşwaziyê de, di sefêñ asayî yêñ perwerdehiya mecbûrî an jî xwendîna pişti mecbûrî de dibistana xwe didomînin.



* Di dema stajê de îmkana xwendekar heye ku qursên Maturité yên entegre bişopîne.

** CFC (Belgeya Xweseriya Federal) sernavê ye ku di dawiya stajê de tê dayîn.

AGAHDARÎ JI BO
XWENDEKARÊN KU
ZIMANEK DIN DIAXIVIN
(ALLOPHONES)
vd.ch > Thèmes >
Formation > Scolarité obligatoire >
Les élèves qui parlent une autre langue (allophones)



Office du soutien pédagogique et de l'enseignement spécialisé

Xizmet, perwerdehiya zarok û ciwanêni ji O heta 20 salî yên bi neşyanbarî û pêdi-viyêni taybet misoger dike û piştgirî dike û bi rîya perwerdehiya karbendî piştgirî dide pêvajoya entegrasyona civakî.

- ⌚ Rue Cité-Devant 11
1014 Lausanne
- ⌚ 021 316 54 01
- ✉ info.sesaf@vd.ch

DIBISTANÊN TAYBET

Pêşniyara dibistanêni taybet ji bo dêûbavêni ku dixwazin zarokên wan li gorî mufredateke taybetî, bi zimanekî biyanî, ji bo her ast û temenî perwerdehiya xwe bidomînîn e. Motorâ légerînê ya li ser malpera Sazûmana vaudoise des écoles privées (AVDEP) dê we bişîne dibistanêni ku li gorî hewcedariyêni we ne.

ZÊDETIR AGAHDARÎ
avdep.ch

LÊNÊRÎNA BIROJ JI BO ZAROKAN

Hema ku zarokê we di dibistanê de be, sazî dikarin li wan binérin, berî, di dema dibistanê û piştî dibistanê. Bi giştî ji wan re APEMS (Accueil pour enfants en milieu scolaire) an UAPE (Unité d'accueil pour écoliers) tê gotin. Ji bo zêdetir agahdarî, hûn dikarin rasterast bi tora lênenîna biroj a şaredariya xwe re têkilî daynin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

- 📘 10 Dema vala û jiyana civakî

→ Sparteka malê ya çavdêrîkî an bi alîkarî

Piştî dibistanê, xwendekar xwedî fersendê ne ku bi amadebûna mezinekê besarî spartekêni malê yên bi çavdêrî an alîkar bibin. Ev çalakî çarçoveyeke fêrbûnê çê-dikin. Dibe ku têkariyeke darayî ya mitewazî ji dêûbavan were xwestin. Ji bo zêdetir agahdarî, bi dibistana zarokê xwe re têkilî daynin.

ALÎKARÎ JI BO DÊÛBAVAN

Sazûmanêni dêûbav-mamoste (APE)

Li kantonê derdora cil sazûmanêni dêûbavan û mamosteyan hene. Ew dikarin ji we re bibin alîkar ku hûn baştir bizanîn ka pergala dibistanêni Vaudê çawa dixebite, û di heman demê de lênenîna biroj a zarakan, çavdêriya spartekêni malê û veguhastînêji. Hûn ê APEna herî nézîkî xwe bi şêwirmenda malperê bibinîn: ape-vaud.ch/ape-locales.

- ⌚ Avenue de Rumine 2
1005 Lausanne
- ⌚ 021 341 90 77 | 078 689 63 63
- ✉ info@ape-vaud.ch
- 🌐 ape-vaud.ch

ZÊDETIR AGAHDARÎ

- 🌐 histoires-de-parents.ch/soutien-orientation-parents

AGAHİYA DERBARÊ
PIŞTGIRIYA DÊÜBAV,
ZAROK Ú CIWANAN DE
🌐 vd.ch > Autorités >



Départements >
Département de la formation de la
jeunesse et de la culture DFJC >
Direction générale de l'enfance
et de la jeunesse DGEJ > Soutien
aux enfants et aux jeunes

➔ Zimanên Zikmakî û kûrsêن çandê (LCO)

Ji bo ku zarokê we li gel fêrbûna Frensi zimanê xwe yê zikmakî ji pêş bixin, li kantonê kûrsêن ziman û çandê (LCO) ji hêla gelek sazûmanên koçberan û hin balyozxaneyan ve têne organîze kirin. Hûn dikarin zarokên xwe li kûrsêن Îtalî, Portekîzî, Spanî, Erebi, hwd., li gorî pêşniyarên heyî qeyd bikin. Dibistan an ji şaredarî dê li ser kûrsêن LCO yên ku herî nêzikî mala we, agahdariya pêwîst bidin we.

ZÊDETIR AGAHDARÎ
➡ 10 Dema vala û jiyana civakî

7.3 JI 15 SALÎ PÊ VE

PIŞTÎ DIBISTANA MECBÛRÎ

Di dawiya kûrsa xwe de, xwendekar xwedî derfet in ku perwerdehiya xwe bi bijartina rêya ku herî baş ji wan re vedibêje bîdomînin. Ew dikarin an xwendina xwe bi şopandina xwendina asta dibistana bilind (*maturité gymnasiale*) ku gihadina Hautes Ecoles û Zanîngehê dide, bîdomînin, an jî bi rêya şagirteke perwerdehiya karbendî bişopînin.

➡ Perwerdeya AFP û CFC

Cihêregî kirina teorî û pratîkê, şagirt (an perwerdehiya karbendî ya destpêkê) dibe sedem ku di 3 an 4 salan de sertifikayek jêhatîbûnê ya federal (CFC) an sertifikayek perwerdehiya karbendî ya federal (AFP) bi dest bixe, li gorî pîşeya bijartî ve girêdayî ye, ku dibe sedema bazara kar û/an perwerdehiya zêdetir. Şagirtî li Swîsreyê pir bi qîmet in.

➡ Navendên rêberiya perwerde û karbendî yên herêmî

5 navendên herêmî yên rêberiya perwerdehî û karbendî dê we di derbarê derfetên heyî de agahdar bikin.

Heke hûn xwe di rewşeke hilbijartî ya perwerdehiyê de bibînin, Office cantonal d'orientation scolaire et professionnelle (OCOSP) bi toreke pisporên rêberiya karbendî û her weha gelek agahdarî ji bo piştgiriya perwerdehiyê xizmetên cûrbecûr pêşkêsi we dike. OCOSP, li gel Navendên xwe yên Herêmî, dikare ji we

re bibe alîkar ku hûn projeyê xwe pêşve bibin û birêve bibin ku hewcedariyên bazara kar û perwerdehiyê, û her weha jêhatîbûn, helwest û berjewendiyê we, û kesayetiya we bigire ber çavan.

Ev xizmetên agahdariya li ser xebat û pîşeyan û ev xizmetên şêwirmendiyê, kolektif an şexsî, ji bo xwendekar û malbatêwan, ciwanên di dema derbasbûnê de an perwerdehiyê de û mezinan, di seranserê jîyana wan de têne armanc kirin.

BIBÎNE KA DIVÊ HÛN
SERÎ LI KÎJAN NAVENDA
RÊBERIYA PERWERDEHÎ
Û KARBENDÎ BIBIN

🌐 vd.ch > Thèmes >

Formation > Orientation >
Contact et adresses de l'OCOSP
et des centres d'orientation



7.4 DÎTINA PERWERDEYÊ LI GEL GIHIŞTINÊ

JI 15 HETA 25 SALÎ

Hûn di navbera 15 û 25 salî de ne, hûn ji du salan kêmtür li Swîsreyê ne, hûn hindik Frensî diaxivin an qet Frensî nizanin û li perwerdehiyê digerin? Portala Koçberiyê ji we re hevpeyivîneke wergirtinê pêşkêşî dike.

PORТАIL MIGRATION

- ⌚ Rue de la Borde 3d
1018 Lausanne
- 📞 021 316 11 40
- 🌐 vd.ch > Thèmes >
Formation > Orientation > Pour
les personnes arrivées récem-
ment dans le canton de Vaud



OFFICE CANTONAL DES BOURSES D'ÉTUDES (OCBE)

- ⌚ Rue Cité-Devant 14
1014 Lausanne
- 📞 021 316 33 70
- 🌐 vd.ch > Thèmes > Formation >
Aides financières aux études et
à la formation professionnelle
bourses ou prêts

BÛRS

Dewlet ji aliyê aborî ve şagirt û berdewamîya xwendinê piştî bidawîbûna dibistana mecbûrî, girêdayî hin şert û mercên welatî-bûnê û niştecihbûnê teşwîq dike. Ev piştgirî ji bo temamkirina aîlkariya malbatê ye, heke hewce bike ku wê temam bike. Bi Office Cantonal des Bourses d'Etudes (OCBE) re têkilî daynin da ku bêtir fêr bibin.

JI BO BIZANIN KA MAFÊ

- WE YÊ WERGIRTNA
BÜRSE HEYE AN NA
- ⌚ Rue Cité-Devant 14
1014 Lausanne
- 📞 021 316 33 70
- 🌐 vd.ch > Thèmes > Formation >
Aides financières aux études et à
la formation professionnelle (bourses
ou prêts > Questions fréquentes
sur les bourses/prêts d'études
et d'apprentissage > Quels sont les
critères pour demander une bourse/
un prêt d'études ou d'apprentissage?



Jî bo ciwanê jî 16 salî pê ve û her kesê ku di perwerdeyê de ye, Xizmeta Jet, Xizmeta Civakî ya Ciwanan a CSP Vaud şêwirmen-diyên civakî û qanûnî yên bêpere û nepenî li cihêن cuda yên kantonê pêşkêşî dike da ku bersiva pirsen we yên têkildarî bûrs, lênerin, budceyê, pirsgirêkên aborî, deyn, derketina ji malê, zehmetiyêñ malbatê, qanûnêñ kar, pirsgirêkên bi qanûnê, gihadina yar-metian, û mijarêñ din ên hiqûqi: sîgorte, ewlehiya civakî, xanî, peyman û hwd. bide.

Jet Service – CSP Vaud

@ jet.service@csp-vd.ch
 ® csp.ch/jetservice

Lausanne

∅ Avenue de Rumine 2
 1005 Lausanne
 ☎ 021 560 60 30

Yverdon-les-Bains

Maison des Associations
 CSP Vaud – Pôle social
 ∅ Quai de la Thièle 3
 1400 Yverdon-les-Bains

Payerne

CSP Vaud
 Pôle social de la Broye
 ∅ Rue des Terreaux 10
 1530 Payerne

Vevey

∅ Li ofisêñ Ginkgo
 Rue de l'Union 15b
 1800 Vevey

8 REWSA MEDENÎ

8.1 QEYDKIRINA JIDAYIKBUNEKE	84
8.2 NASKIRINA BAVITIYÊ	85
8.3 ZEWAC	86
8.4 PROSEDURA DI REWSA MIRINÊ DE	89



8.1 QEYDKIRINA JIDAYIKBÛNEKÊ

GAVÊN DIVÊ BÊN BICIH ANÎN

Jidayikbûna zarokek divê di nav 3 rojên welidandinê de li qeyda medenî ya cihê welidînê were tomar kirin. Di bûyera welidandina di nexweşxaneyê de, dûvre çavdêriya qeydkirina jidayikbûnê tê kirin. Di bûyera welidandina li male de, bav, dê, pîrik, bijîşk an jî her kesê ku di dema welidînê de hebe divê wê li qeyda sîvîl qeyd bike. Heke dêûbav li qeyda medenî ne qeydkirî bin, servîsa têkildar dê belgeyên zêde bixwaze da ku nasnameya dêûbavan piştast bike. Piştî van formalîteyan dêûbav dikarin belgeya welidandinê ji qeyda sîvîl bixwazin.

Belgeya welidandinê dikare li ser wergirtina agahdariya welidandinê, ku ji hêla nifûsa medenî ya ku bûyer qeyd kiriye ve hatî şandin, ku bi xercê 30 CHF (ji bilî posteyê) were xwestin.

Dema ku welidîn li derveyî welat çêbûye û divê li Swîsreyê were qeyd kirin, nûnertiya Swîsreyê ya cihê bûyerê dê bikaribe di formalîteyan de alîkariya we bike.

Jidayikbûna zarokênu ku dêûbavênu wan ne xwedî welatîbûna Swîsreyê ne jî dikarin li balyozxane an konsulxaneya welatê jêderê bêne qeyd kirin. Département Fédéral des Affaires Etrangères (FDFA) navnîşeke nûnertiyyêni biyanî yên li Swîsreyê û nûneratiyyêni Swîsreyê yên li derveyî welat amade dike.

Welidandin di navbera zarok û dê û mîr de têkiliyek qanûnî çedike.

Gava ku dêûbav ne zewicî bin, bav mecbûr e ku zarokê xwe qebûl bike ku ew bixwaze bi fermî û qanûnî wekî bavê zarokê were naskirin.

AGAHDARIYA GIRÊDAYÎ
JIDAYIKBÛNA ZAROKEKÊ
🌐 vd.ch > Thèmes >
Population > État
civil > Naissance



SERÎ LI NAVNÎŞA NÛNERTIYÊN
BIYANÎ LI SWÎSREYÊ BIDE
🌐 eda.admin.ch > Conseils aux
voyageurs & représentations >
Représentations étrangères en Suisse

8.2 NASKIRINA BAVİTYÊ

ÇARÇOVEYA DADMENDÎ

Naskirina bavîtyê kiryareke qanûnî ye ku bi wê yekê mér qebûl dike ku bavê zarokek e. Heke dê û bavê zarok bi hev re nezewicî bin, divê di navbera bav û zarokê de xizmatî (têkiliya qanûnî) bi kiryariyeke qanûnî were danîn.

Naskirina bavîtyê bi danzanînê li ber qeyda medenî pêk tê. Hema ku naskirina bavîtyê té qeydkirin, girêdanên parêzbendiyê têkiliya bav û zarokê birêve dibin, ango erka xwedîkirinê heya ku zarok bigihê temenê mezinbûnê, an ji heta dawiya perwerdehiya zarok, mafêñ dualî di mijarêñ li pey hev û erkên hev di mijarêñ alikariyê de hene.

Ji bo ku naskirina zarokek derbasdar be, divê şertên jêrîn bêne bicîh anîn:

- Tenê bavê biyolojîk dikare zarokê nas bike. Divê nivîskarê nasnameyê jêhatiyî ferqîrinê be.
- Heke nivîskarê nasnameyê biçük an qedexe be, razîbûna dêübav an welî hewce ye.

Heke bavê zarok bi jineke din re zewicîbe ji naskirin dikare were destnîşankirin. Naskirin dikare berî an piştî jidayikbûnê pêk were.

Wexta ku dayik di dema jidayikbûna za-rokê xwe de zewicî be, qanûn ji bo mîrê

wê pêşniyara bavîtyê dide. Heke dûvre ne bavê zarokê be, berî ku naskirin were kîrin, divê ev girêdana xizmatiyê were betal kîrin. Ji bo vê yekê, divê prosedureke redkîrinê li ber dadgeha pêwendîdar were derxistin.

Heke bav naskirina zarokê red bike, dê an ji zarok ji bo dêübavtyî dê dozê veke, da ku bavîti bi dadkîrinê were damezrandin.

Çalakiya naskirinê daxuyaniyeke bêveger e. Naskirin di navbera bav û zarokê xwe-zayî de têkiliyekê çêdike. Zarokê naskirî bi taybetî xwedî mafê mîrasê ji bavê xwe ye û mafê nefeqeyê heye.

DEST BI PROSEDUREKE
NASKIRINA
BAVİTYÊ BİKE
• vd.ch > Thèmes >
Population >
Etat civil > Reconnaissance



8.3 ZEWAC

BI KURTÎ

Mafê zewacê di Makezagona a Federal de cih girtiye. Ew ofisa tomara sîvîl e ku ji cibicîkirina wê berpirsiyar e. Swîsre her wiha zewacên ku li derveyî welat hatine kirin nas dike.

ŞERT Û MERC

Ji bo ku zewacek çêbibe, cotêne nîşanekirî, ci Swîsreyî be an na, divê şertên jérîn bicîh bînin:

- ⇒ Temenê wan herî kêm 18 salî be.
- ⇒ Bikarin îdraq bikin.
- ⇒ Jixwe ne zewicî be.
- ⇒ Xwediyê destûra nûnerê qanûnî be, heke yek ji du kesan di bin wezîfeyê de be.
- ⇒ Di navbera wan de lêzimatiya biratî (di nav de xwîşk û birayên jînbav), dayiktitî an bavîti (bûyera zarokgirtinê jî di nav de) an têkiliyek bapîrî nebe.
- ⇒ Dema ku yek ji hevjinê pêşerojê ne welatiyê Swîsreyê be, divê belgeyekê pêşkêş bike ku ew xwedî destûr e ku heyâa zewacê li Swîsre bimîne.

Lêbelê, hûn nikarin bizewicin heke:

- ⇒ Hûn jixwe zewicî ne an bi partneriyek qeydkirî ve girêdayî ne.
- ⇒ Hûn nikarin îdraq bikin.
- ⇒ Lêzimtiyekê nézik li gel partnerê we heye.
- ⇒ Zewac ji bo ku ji bendêni li ser qebûlkirina biyaniyan revînê tê kirin.
- ⇒ Zewac ne bi dilxwazî ye û tu bi dare zorê dizewice.

PROSEDURA ZEWICÎNÊ

Ji bo ku hûn bikaribin bizewicin, divê hûn daxwaznameyek zewacê pêşkêşî ofisa qeyda sîvîl bikin.

CENTRE ADMINISTRATIF
DE L'ÉTAT CIVIL
 021 557 07 07
 vd.ch > Thèmes >
 Population >
 État civil > Mariage



Dûv re hûn hewce ne ku forma «Prosedureke zewacê ya amadekariyê vekin», ku ji hêla ofisa rewşa medenî ve li ser daxwaza zewacê tê radest kirin temam bikin. Li gorî rewşê, hûn hewce ne ku belgeyêna cuda bişînin (guh bidin agahdariya ofisa qeyda sîvîl). Pişti radestkirina

belgeyan, bî kesane li ofisa qeyda sîvîl piştrast bikin ku hûn hemî şertan pêk tînin. Di bûyera astengkirina razîbûna we ya azad de, xizmetên alîkariyê hene. Bi darê zorê zewicandin sûc e û zewac dikare bê betalkirin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

6.3 Tundiya nav malê

→ Hûn di metirsîya zewaca bi dare zorê de ne

Şêwîrmendîya herwe ji bo kesén di rewseke zewaca bi darê zorê de ne an ji bi zextên derderôn xwe re rû bi rû dimînin da ku têkiliyekê dest pê bikin an bidawî bikin, şêwîrmendî ji pisporênu ku van kesan diparêzin.

BUREAU CANTONAL
POUR L'INTÉGRATION
DES ÉTRANGERS ET
LA PRÉVENTION DU
RACISME (BCI)
Ⓐ Avenue de Sévelin 46
1014 Lausanne
✉ 021 316 49 59
✉ info.integration@vd.ch
🌐 vd.ch/integration



Ofîsa sîvîl paşê daxwaza we dinirxîne û bi nivîskî we agahdar dike ka hûn dikarin bizewicin an na. Divê zewac di nav 3 mehan de piştî bidawîbûna pêvajoya amadekariyê pêk were. Merasim li salonên dawetê yên kantonê an jî rasterast di nav dezgehêni nifûsa sîvîl de pêk têن, heke hema piştî girtina proseya amadekirina dawetê pêk werin.

Her wiha ew dikarin li «cihêñ awarte» we-rin girtin, ku bi rêkûpêk hatine navnîş kirin (serdana malpera qeyda sîvîl bike). Divê du şahidên sereke yên ku jêhatîyî idraqê ne amade bin. Heke cotê nîşanekirî ji zimanê ofîsa sîvîl a ku zewac lê tê pirozkirin fam nekin, divê wergêrekê bikar bînin û lêçûnên têkildar bixwe bidin.

Di merasimê de, herdû hevjin û herdû şahid-an erêkirina zewacê, ku ji berê ve hatine amadekirin, îmze dikan. Di dawiya dawetê de, jin û mîr belgeya malbatbûnê distînin.

Berdêlên zewaca medenî bi giştî di navbera 300 û 500 CHF de tê guhertin. Daxwazên taybetî, wek şahiyeke roja şemiyê an li derveyî salona dawetê ya fermî ya Lausanne, mesrefên zêde digirin. Xerc di heman demê de dibe ku lêçûneke mezintir bigre, bî taybetî di hebûna belgeyên rewşa medenî yên biyanî de ku dê bêne pejirandin. Hûn dikarin bî olî ji bizewicin, lê tenê piştî merasima sîvîl.

PROSEDURÊN PÊWÎST ÊN PIŞTÎ ZEWACÊ

Divê hûn guhertina rewşa zewacê ya xwe ji rayedaran, kardêrê xwe, meqamên bacê, banka xwe, şirketên sîgorteyê û hwd re ra-ghînin. Dema ku peymanên nû çêdikin divê rewşa zewacê ya nû ji were destrişan kirin.

Dema ku navê we bi zewacê re hat guhertin divê hûn belgeyên fermî ji biguherînin. Bi taybetî, divê hûn belgeyên jérîn nû bikin:

- ⇒ Pasaport an karta nasnameyê.
- ⇒ Sertîfika AVSê.
- ⇒ Ehliyet û destûra gerînê.
- ⇒ Kartên bankayê û kartên krediyê.
- ⇒ Belgeya Resenî.

PIŞTÎ ZEWACÊ PARASTIN AN JÎ GUHERTINA PAŞNAV

Her yek ji hevjinan nav û cihê eslê xwe di-parêze. Digel vê yekê, zava dikarin diyar bikin ku ew dixwazin navê mîr an jîjinê wekî paşnavê xwe yê hevpar bikar bînin. Zarokên dêübavê zewicî an paşnavê hevpar wer-digirin an jî – heke dêübav paşnavên cuda hebin – paşnavê yekta yê ku dêübav di dema zewacê de an jî di dema jidayikbûnê de wekî paşnavê xwe hilbijartine. Heke ew li Swîsreyê nezewicî bin û di dema zewacê de neçar nemabin ku vê hilbijartinê bikin. Dema ku desthilatdariya dêübav tenê ji hêla yek ji dêübav ve tête kirin, zarokê paşnavê berî zewicînê yê din digire. Lîbelê, bizanîn ku heke dêübav zewicî bin, desthilatdariya dêübav bi hev re tête bikar anîn. Bi ser de jî, heke ew ne zarokê yekem be, zarokên jérîn dê bi şertê ku navê malbatê ji bo za-rokê yekem hatî hilbijartin, li gorî prensîba yekîtiya xwişk û bira hilgirin.

Divê were zanîn ku, di belgeyên adetî yên wekî kaxezên nasnameyê de, bikaranîna paşnavê yekane bi navê hevjinê re mimkun e ku mirov navekî zewacê bi daçek bikar bîne.

Wekî din, di bûyera betalbûna zewacê de, di dawiya dozêن hevberdanê de an jî piştî mirina yek ji hevjinan, hevjina ku di dema zewacê de navê xwe guherandiye, dikare her gav ji nifûsa sivil re ragihîne ku ew dixwaze navê xwe yê berî zewacê ji nû ve bidomîne.

Jİ NAVÊN YEKTA YÊN
HEVJÎNAN HILBIJÉRE

vd.ch > Thèmes >
Population > État civil >
Mariage > Choix du nom
de famille et lieu d'origine (droit de cité)



8.4 PROSEDURÊN DI REWŞA MIRINÊ DE

BI KURTÎ

Pêwîst e ku her mirinek di nav 2 rojan de li qeyda medenî ya cihê bûyerê were tomar kirin. Dema ku kesê mirî ji welatîbûna biyanî be, ew li ser xizmên wan e ku mirina wan ji rayedarên welatê wan re tomar bikin. Di bûyera mirina li derveyî welat de, divê mirin ji rayedarên rewşa sivil a Swîsreyê re bi rîya nûnertiya Swîsreyê ya cihê mirinê were ragihandin.

Dî bûyera mirina yek ji hevjinan de, hevjinâ ku di dawiya zewacê de navê xwe guhertiye, dikare her gav ji qeyda sivil re diyar bike ku ew dixwazin vegerin ser navê xwe yê berî zewacê.

Li gor cihê ku rûniştina kesê mirî lê ye, pêwîst e ku rayedarên şaredariyê jî agahdar bikin. Bi taybetî ji ber ku gelek şaredariyên Swîsreyê ji bo cenazeyan xizmetên bêpere pêşkêş dîkin (veşartın, şewitandin, merasima cenaze, hwd.); Ji ber vê yekê dibe ku ya baş ew be ku ewil lêpirsîn bikin da ku hûn bikarin ji van xizmetan bêpere sûd werbigirin.

Her wiha bizanin ku pêkan e ku ji banka kesê mirî daxwazek were kirin ku fonan veke da ku lêcûnên girêdayî cenaze bide. Pir sazî di dema mirinê de hesaban asteng dîkin (ji bo mebestên baca mîrasê), lê dibe ku hin bank destûr bidin ku fon werin vekirin.

RAGİHANDİN Û
QEYDKIRINA MİRINEKÊ
vd.ch > Thèmes > Population > État civil > Décès



CENAZE

Divê kesê mirî ji bo cîhekî parastinê were veguhestin. Bi giştî, piştî «pejirandina mirinê» ya ku ji hêla nîfusa sivil ve hatî dayîn, desthilatdariya şaredariyê destûr dide veguhestin û veşartina miriyan. Veguhastin ji hêla rêveberekî cenaze ve ku ji hêla Département de la Santé et l'action sociale (DSAS) ve destûr dayî ve tête kirin. Veguhastin jî dikare pêşî li ragihandina rayedaran bigire. Li Swîsreyê divê di navbera 48 û 98 saetan piştî mirinê de cenaze bên pêkanîn. Li gorî herêmê, cenaze heta 5 rojan piştî mirinê, dema ku cenaze di odayeke sarincokê de tê hilanîn dikare were organîze kirin.

Swîsre mazûvaniya cûrbicûr ên merasimê cenazeyan dike. Ji ber vê yekê organîzasyona cenaze dê pir bi cûreya merasîma bijartî ve girêdayî be, lê forma wê çi dibe bila bibe, merasîma bijartî dê hin lojistikên bingehîn hewce bike:

- ➔ Veguhaztina term.
- ➔ Hilbijartina cih, roj û dem ji bo merasimê.
- ➔ Navnîşa kesên dê werin vexwendin.
- ➔ Daxuyaniyênen cenazeyê (wek mînak bi îlana morgê).

Edet e ku mirov li rêvebirê cenazeyan bigere ku di van gavan de li gel wan bin.



TÊKILIYA Ú DAXWAZA BELGEYÊN STATUYA SIVÎL

Jî bo siparîskirina belgeyên statuya sivîl (belgeyên jidayikbûnê, sertîfikayên mirinê, hwd.) hûn dikarin wan li ser malpera kantonê daxwaz bikin an jî dibe ku telefonî navenda îdarî bikin. Ew ê paşê bi posteyê ji we re bêne şandin.

CENTRE
ADMINISTRATIF
DE L'ÉTAT CIVIL

⌚ 021 557 07 07
🌐 vd.ch/etat-civil
🌐 vd.ch > Thèmes >

Population > État civil >
Commander un acte d'état civil



ŞÊWIR

Jî bîr nekin ku van guhertinan ji konsulkane an balyozxaneya welatê xwe re jî ragihînin.


Bi rastî, ci taybet an giştî (fermî), rêvebirênen cenazeyan dikarin di pêvajoyê de gelek zû piştgirî bidin we û hem di prosedurên îdarî û hem jî di organîzekirina cenaze de ji we re bibin aîkar. Ew xwedî rola hevrêziyê de navbera malbata mirî û saziyên cûrbicûr ên destwerdanê de ne û dikarin xizmetan jî pêşkêş bikin, wek şûştina li morgê û lê-nêrîna laş. Karkerên şirketên cenazeyan ên ku lê-nêrîna miriyen pêk tînin piştast dikin ku ew bi rêtzgirtina rûmeta kesê mirî û li gorî kevnesöpiyên wan ên çandî û olî pêk têñ. Rêvebirênen cenazeyan bi giştî amade ne ku rêzek ku ji we re watedar e saz bikin. Bi rastî, hewcedarî û daxwazênen we di warê cenazeyan de ci dibe bila bibe û baweriya we ci dibe bila bibe, hûn ê karibin rêvebereke cenaze bibînin ku xizmetên wan bi tevahî li gorî hêviyên we werin adaptekirin û ew ê bikaribin bi baldarî û lê-nêrineke baş, bêyî darizandin wan bi cih bîne.

Hûn ê navnîşa derhênerên cenazeyen cihêring û hem jî zêdetir agahdarî li ser vê mijarê di malpera Direction Générale de la Santé de bibînin.

DIRECTION GÉNÉRALE
DE LA SANTÉ
OFFICE DU MÉDECIN
CANTONAL

⌚ Avenue des Casernes 2
1014 Lausanne
⌚ 021 316 18 00
🌐 vd.ch > Thème > Santé, soins et
handicap > Pour les professionnels >
Autorisations de diriger et d'exploiter >
Inhumations et pompes funèbres





9 JIYANA ROJANE

9.1 GERYAN LI HERÈMA VAUDÈ	92
9.2 ABORÎ	94
9.3 TELEKOMÍNASYON Û KIRÎN	96



9.1 GERYAN LI HERÊMA VAUDÊ

BI OTOBUS Û METROYÊ

Mobilis bilêta yekane ye ji bo tevahiya kantonê û 309 şaredariyên wê. Ew dihêle hûn hemî rêgezén veguhastina giştî bi hevgirtina wan li gorî dilê xwe bikar bînin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

✉ mobilis-vaud.ch

Ji bo rêuwîtiyên yekcar, bilêtên otobusê dikarin rasterast li rawestgehan an li ser telefonên jîr werin kirîn. Li hin şaredariyan bilêt ji ajokarê otobusê têne kirîn.

BI TRÊNÊ

Tora veguhastina giştî ya Swîsreyê berfireh û pir pêşkeftî ye. Rêhesinêni Federal ên Swîsreyê (CFF) bilêtên demsalê yên wekî bilêta demsala giştî (AG) pêşkêşî dike ku dihêle rêuwîtiya li seranserê Swîsreyê bi veguhastina giştî (trêن, otobus, bot, metro, hwd.) an jî bilêta demsalî ya nîv biha ku destûrê dide hûn rêuwîtiya bi nîv biha bikin. Ji bo zêdetir agahdarî, li îstasyona herî nêzîk bi kontûar re têkîlî daynin an serdana malpera CFF bikin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

✉ cff.ch

⇒ Mobilis – Vaud

Wekheva AG ji bo kantona Vaud heye. Ew abonetiya Mobilis e ku dihêle hûn li seranserê herêma Vaudê an jî li ser rêyeke taybetî (mînak Lausanne – Yverdon-les-Bains) bi veguhastina giştî bigerin.

ZÊDETIR AGAHDARÎ

✉ mobilis-vaud.ch

Girîng e ku mirov ji xebatkarên kontûarê yên li îstasyonan agahdariya baş bistînin, da ku abonetiya herî bikêr û ya ku bi rêuwîtiyên ku rojane têne kirin re herî baş têkîldar e hilbijérin. Girîng e ku mirov ji xebatkarên kontûarê yên li îstasyonan agahdariya baş bistînin, da ku abonetiya herî bikêr û ya ku bi rêuwîtiyên ku rojane têne kirin re herî baş têkîldar e hilbijérin.

⇒ Derbasbûnên biroj

Hin şaredarî ji niştecîhêن xwe re derbasbûnên biroj bi bihayê bijarte pêşkêş dikin: ev dikarin bi telefonê, li kontûarê an jî online li ser malpera şaredariya we werin veqetandin.

⇒ Bilêtên superteserûf

CFF her wiha, li gorî saetê, bilêtên superteserûf (= bihayê kêmkirî) pêşkêş dike. Ji bo gihîstina vê agahiyê, herin malpera CFF an jî sepana telefona jîr CFF daxînin.



HIŞYARÎ

Ji bo ajotina li ser otobanê Swîsreyê, mecbûrî ye ku hûn vînyeta salane (CHF 40) ku hûn ê li ser cama xwe bixin bikirin. Ew dikare li stasyonê servîsê, kiosk an li postexaneyê were ditin. Vînyeta salane heta 31 Çile derbasdar e. Di wê mêmûyê de, hûn ê hewce bin ku lêdanka nû bi dest bixin û bi cama xwe vezin.

→ Rewitiya bi zarokan

Zarokên di bin 6 salî de heke li gel kesekî bi bilêteke derbasdar û kesekî 12 salî an mezintir bin, rêuwityê herwe dikan. Bi karta Junior, ji bo 30 CHF her sal, zarokên ji 6 salî ji hêla yek ji déûbavêne xwe ve ku bilêteke derbasdar a veguhastinê heye, dikarin tevahî salekê bêpere veguhastina giştî bikar bînin. Karta Junior ji zaroka 3yemîn û pê ve belaş e.

BI EREBEYÊ

Kesênu ku ehliyeta ji derveyê welat hene, 12 meh ji hatina wan mohlet heye ku ehliyeta biyanî bi belgeyeke Swîsreyî bi-guherînin. Li gorî welatê jêderê, dibe ku ezmûnek pratik û/an nivîskî were xwestin.

SERVICE DES AUTOMOBILES
ET DE LA NAVIGATION
Ⓐ Avenue du Grey 110
1014 Lausanne
📞 021 316 8210
✉️ isan.navigation@vd.ch
🌐 vd.ch/san

BI DUÇERXEYÊ

Bisiklêt amûrekî çûnûhatinê ya pratik û ekolojîk e ku ji bo rêuwityê kurt pêk tê. Lixwekirina helmet ne mecbûrî ye, lê bi tundî tê pêşniyar kirin.

Ev çend sal in, Kantona Vaud pêşvebirina rê û parkûrên bisiklêtan (bi rengê zer hatine nişandan) li kêleka rê û rêuwîn meşînê, û her wiha parkên duçerxeyan teşwîq dike.

Hin bajarok derfeta kirêkirina bisiklêtan jî pêşkêş dikan.

VIŠE INFORMACIJA

🌐 publibike.ch/fr/publibike

